



'Ayikê bizina kol ji ya bi qiloc re namîne'

Rûpel 6 - 7

- **Ji penûsa** Hesen Hişyar **ê rehmetî, ji destpêkê heta dawiyê Serhildana Şêx Seîd Efendî** Rûpel 12
- Amed Tîgrîs, **der barê xinizî û xwefiroşiya dîrokî ya kurdan de, nivîsî** Rûpel 7.
- Firat Cewerî, **bi sernavê nivîsa "Nasnava edebiyata bedew ziman e" balê dikişîne mijareke girîng** Rûpel 13
- Ahmet Soner, **"Ji serî heta dawiyê, çîroka kişandina filmekî"** Rûpel 5

NAVEROK



4

Netîceya Sempozyûmê:
Divê agirbest du alî be



8

"EW", Rahmi Batur bi vî navî
serpêhatiya "Wî" nivîsî



16

Gulên Mezrabotan: 'Em
cîhanê bikin dibistana azadiyê'

Ji xwendevanan

BI raya min zimanê rojnameyê di bin bandora zimanê tirkî de dimîne. Ji vê yekê re mînak "agirbest" e. Bi qasî ku ez dizanim, bêjeya "Ateş Etmek" bi lêkera berdan tê zimên. Nivîskarê me rahiştine "agir" danîne şûna "ateşkesê". Ma şerrawestî ne çêtir e?! Mînakeke din: Ev hevok ji aliyê Aynur Bozkurt ve jî tirkî hatiye wergerandin: "Vê zaroktiyê di bûyêra herî dawî ya revandina keştiyê û pirsgirêka çeçenan de bi awayekî vekirî û çîp û tazî em jiyabûn." Gelo 'em jiyabûn' çi ye? Kesê bi tirkî nizane, tiştêkî jê dernaxe. Dema, lêker ne rast be, hevok nayê fêmkirin.

Ji bîr mekin ku hûn rêberê zimanê me ne. Ger hûn di riya rast de bimeşin, emê jî bimeşin.

BAGER KAYACAN
ENQERE

WELAT

Tu bi xêr û xweşt hatî!

Hevalên me Hawa û Salihê Kevirbirî jî bûn xwedî lawekî.

Em dibêjin çavên we bi ronî bin, Welat, bi dê û bav li welatekî serbixwe û azad mezin bibe.

Xebatkarên Azadiya Welat

WELAT

Serê du heftiyên e, derdorên aştxwaz civînan pêk tînin. Ji hawirên kurd û tirkên û yên din, di wan civînan de cih distînin. Tev jî, li ser pêwîstbûna sekinandina şer û saffikirina meseleya kurdî radiwestin. Eşkere dikin ku hewce ye dewlet jî agirbest îlan bike.

Ev gavavêtin û hewl, girîng in û divê xurtir û firehtir bibin. Dema guftûgoyan hatiye û heta bihuriye jî. Êdî dinya alem li ser helkirina meseleyê tiştinan dibêje, her kes der barê vê yekê de xwedî çare û bernamayan e. Em beşdarî her du civînan jî bûn, ji me re hin bawerî çêbûn. Ez dixwazim li ser vê yekê çend tiştan bibêjim. Du her duyan de jî kurdan, daxwazên mirovî (însanî), kesên ji derveyî kurdan jî, daxwazên siyasî dianî ziman. Heta li ser vê rewşê, rexne jî li kurdan

Em navê meseleyê lê deynin

dikirin. Digotin "Hûn çî dixwazin eşkere bibêjin." Bi ya min jî vî aliyê ve kurd pasîv diman. Ji hêla din ve, kesên ku li ser navê kurdan dipeyivîn, li hemberî yên din, di bin de diman. Nimûne, li hemberî kesên mîna Prof. Doğu Ergil û Prof. Mahir Kaynak kêr-çap diman.

Divê em li ser çend xalên din jî rawestin. Kesên mîna Bahri Zengin (mêbûsê Partiya Refahê) û İsmail Nacar, wekî ku, ji bo li kurdan nesihetan bikin, ketibûn civînan. Ji aliyê din ve sedemên gelş û gelemşa heyî, bi siyasîyê kemalîst û hêzên împeryalîst ve girê didan.

Li gorî wan, bi tenê îslam dikare meseleyê hel bike. Ma ew bi bîra xwe naynin ku, ev mesele ta ji destpêka sedsala 19'an, wekî îro; heye. Wekî din, gelo ev meseleya kurdan li Îran, Iraq û Sûriyeyê jî nîn e?

Kesên ku çareyê her bi hatina demokrasiyê ve girê didan jî hebûn. Wekî Ercan Karakaş, (mêbûsê CHP'ê). Vî camêrî jî digot ku, "Heke demokrasî li Tirkiyeyê bi cih bibe, mesele jî safî dibe."

Gelo ew demokrasiya ku li Fransayê heye, meseleya Korsiyayê hel kiriye? Na! Lê helê, ev kes demokrasiya ku li Ewropayê heye, ji xwe re wekî mînak digirin. Jixwe, demokrasî, encama têkoşîn û kefteleft-ên bi sedan salan e. Bi xwestin û gotînan, pêk nayê.

Di dawiyê de em vê bibêjin. Meseleya kurdan, ne meseleya demokrasiyê û mafên mirovan e. Ne, encama rejîmên nepak û stemkar in. Ev gelş û arîşe, neteweyî ye. Daxwaza, diyarkirina qedera gelekî "parçebûyî" ye.

MEHMET GEMSİZ

Rêxistinên mafên mirovan

Ew qas komeleyên mafên mirovan li cîhanê hene û hêzdar in, lê dîsa mirovatî bi giştî li ser rewşa Kurdistanê, jiyana gel û hovîtiya li dijî mirovahiyê baş agahdar nabe. Gelo hûn li sedema vê yekê qet fikirîne?

Komên mafê mirovan û komîsyonên dewletên Ewropayê û Amerîkayê yên mafên mirovan û rêxistinên ne-hikûmetî (NGO) li ser bûyerên ku li Latin Amerîka, Afrîkaya Başûr, Kurdistanê dibin bi qasî ku pêwîst e, nasekinin lewma. Her xebata jî bo mafên mirovan, girêdayî pêwendiyên dewletan û bîrdoziya wan e. Heke dewletek wekî Tirkiyeyê dûvikê dewletên împeryalîst be, dewletên Ewropa û Amerîkayê navê demokrasiyê li wê dikin û diyar dikin ku mafê mirovan tê parastin. Lewre jî, beriya ku kom, bixwazin li ser mafên mirovan li hemberî welatekî dengê xwe bikin, divê pêşî destûrê ji dewletên xwe bixwazin.

Her çiqas hinek awarteyên vê yekê hebin jî, bi piranî wisa ye. Hinek komîsyonên mafên mirovan, li şûna ku li mafê mirovan xwedî derkevin, li dijî tevgera serxwebûn û azadiya welatên bindest derdikevin. Navê terorê li têkoşînên wan dikin. Di dîroka şoreşên gelê bindest de, wekî mînak li Kuba û Nikaraguayê, ev xalên jorîn pir spehî hatin diyarkirin. Dema şoreşa Kuba û Nikaraguayê bi ser ket, li Ewropayê rêxistinên ku navê "komeleyên mafê mirovan" li xwe dikirin, rêveberên wan welatan wekî diktator bi nav kirin û îdia kirin ku ew xebatê bi awayekî terorîst dimeşînin. Wan komeleyan li ser

Di salên 70 û 80'an de dewletên cîhana 3'an, dikaribûn di hinek xalan de bandora xwe li ser NY'ê bihêlin. Lê îro bêtir biryara Amerîka û hinek dewletên Ewropayê ev rêxistin nikare tiştêkî bike.

İLHAN KIZILHAN

hovîtiya Somoza dengê xwe nekirin. Îro rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên din yê bi fermî ne girêdayî dewlet û hikûmetan e, di destpêka 1990'î de derketine holê û bûne hêzeke nû di cîhanê de. Ev rêxistin li cîhanê kêr-çêde hemû girêdayî hev in, pêwendiyên wan bi hev re hene. Niha jî dikarin bandora xwe li raya giştî û her wiha jî di warê demokrasiyê û mafên mirovan de li ser dewlet û hikûmeta xwe bihêlin. Rêxistinên wekî Amnesty International, Green Peace, Helsinki Watch, di cîhanê de giraniya wan a siyasî çêbûye. Heta rojnameya Almanayê ya kevneperest Die Zeit dibêje ku di nav dewletan de ev rêxistin bûne hêza 3'an. Lê ku mirov bi kûrahî vê mijarê tevde, mirov dibîne ku Neteweyên Yekbûyî (NY) serkêşiya wan rêxistinên ne-hikûmetî (NGO - Non Governmental Organization) û hinek komên mafên mirovan dike. Îro baş diyar bûye ku, NY di destê kê de ye. Ji her dewletê zêdetir dewleta Amerîkayê vê rêxistinê finanse dike. Di salên 70 û 80'an de dewletên cîhana 3'an, dikari-

bûn di hinek xalan de bandora xwe li ser NY'ê bihêlin. Lê îro bêtir biryara Amerîka û hinek dewletên Ewropayê ev rêxistin nikare tiştêkî bike. Rayedarên van rêxistinên ne girêdayî dewletan, bi xwe parçeyek ji civaka xwe ne lewre jî bi çavê vê civakê li kategoriyê demokrasiyê, çandê û jiyane dinêrin.

Nivîskarekî Latin Amerîkayê Gabriel Garcia Marquez, di axaftina xwe ya ji bo standîna Xelata Nobelê de vê pirsiyê dîke: "Çima hûn (welatên Rojava) mafê didin me ku em di pirtûkê xwe de li ser şoreşê binivîsin. Lê di karvaniyê de ji bo guhertina civakê hûn li dijî mîrdê dîkevin?" Garcia Marquez wiha dom dîke:

- Çima welatên Ewropayê dixwazin civakê xwe ji bo başiyê bi pêş ve bibin û biguherînin, lê li Latin Amerîkayê wî mafî nadin me û naxwazin ku em bi metodên xwe, li gorî hebûna gelê xwe civaka xwe biguherînin?

Li ser rewşa mafên mirovan li Latin Amerîkayê, Sekreterê Ronald Reaganê Elliot Abrams wiha dibêje: "Em divê ne tenê li ser mafên mirovan rawestî divê em bizanibin ku bîrdoziya wan çê ye..."

Çawa di dema dagirkerî û metirgeriyê de Ewropayê, pêşî keşe û pirtûkên xwe yên xiristîyanî bi rê dikirin pişt re leşkerên xwe şandin û ew welatan kirin. Her wiha niha jî, gumanek wiha li ser wan rêxistinên ji derî dewletan û komên mafên mirovan ên Ewropa û Amerîkayê heye. Heta pir ji wan rêxistinan jî, ji aliyê wan dewletan vî bi dizî hatine damezirandin an jî vî veşartî tîne finanse kirin.



XWENDEVANAN ji bo hilanîna xercên zanîngehê roja 4'ê reşemiyê li Taksîma Stenbolê, roja 5'ê reşemiyê jî li Kızılaya Enqereyê numayîş li dar xistin. Wekî tê zanîn xwendekaran bi hinek daxwazên wekî, hilanîna xercan, vekîşîna polîsan ji zanîngehan, berî çend mehan li Zanîngeha Yıldızê dest bi greva birçîbûnê kiribûn. Xwendekaran bi van çalakiyên xwe bala raya giştî kişandin ser doza xwe, lê hêzên dewletê jî destvala nese kinîn. Di her du çalakiyan de piştî hinek rûdanên provokatîf, şer û pevçûn derketin û gelek xwendevan piştî lêdanên xedar, hatin girtin.



DI'E'yê (Enstîtuya İstatistikê ya Dewletê) da zanîn ku li Tirkîyeyê 10 milyon însanên betal û 8 milyon jî feqîr hene. Li gorî îstatistikên sala 1994'an, kesên ku kar bi dest naxin % 10.5 e. Ev rêje her sal zêde dibe. Dîsa li gorî îstatistikên DI'E'yê, gel jî her diçe xizantir dibe. Ev jî rasterast nîşan dide ku şerê taybet her sal zêdetir li ser aboriyê bandora xwe çêdike û kesên ku ji vê yekê zirarê dibînin jî, bi piranî însanên kedkar in. Maxdûrên şer ên ji Kurdistanê hatine koçkirin, ji herkesî zêdetir ji vê rewşa kambax zirarê dibînin. Betalî û xizanî li aliyekî, pariyek nan û xaniyek bi dest nakeve.

NÛÇE

DIK

Mêjiyên pûç

Mirov ku li gorî mantiq bifikire, ew peyvên li jor ne rast in. Ji ber ku, 'pûç' bûna mêjî ji aliyê objektîvîteyê ve ne mumkun e. Dema ku feila pûçbûnê çêbe; di wê demê de mêjî edî ne mêjî ye. Ev, mîna goşt bê dîtin çêtir e. Lê, ji aliyê din ve mumkun e. Zanîna min ev e, heke ku hinek tiştan mirov zû ji bîra xwe bike û pişt re jî bi sextekarî wan xelet nîşan bide, wê gavê navê pûçbûna mêjî dikare lê deyne. Ev yek di nava çapemeniya tirk de gelek cih standiye. Di vî warî de bi kêfxweşî pesnên xwe jî didin.

Heftiya berê, di Rojnameya Milliyetê de nûçeyek hatibû weşandin. Di vê nûçeyê de tê gotin ku "....polîs di operasyonê de çend endamên PKK'ê, kasetên bi kurdî, şeşar (demançe) û ala PKK'ê girtiye." Kasetên bi kurdî wekî hacetekî sûc hatine nîşandan. Ew yek bi ya min, bi taybetî hatiye kirin.

Hîna jî neqediya. Nimûneyên vê yekê pir in. Der heqê endamêkî HADEP'ê de, ji bo ku di Newroza 1995'an de, bi kurdî "Newroz pîroz be" silav li gel kiribû doz hatiye vekirin û bi îdiaya "cudaxwaziyê" niha tê darizandin.

Her tişt edî eşkere diqewime. Bi kurtasî, armanc darizandina zimanê kurdî ye. Lê belê, dewran ne dewrana berê ye, bila baş bê zanîn.

Gerek e xwediyê vî mantiqî bizane ku, bi wî awayî û bi vî mêjiyê pûç, bipêşveçûna tu gavekê ne mumkun e û ew qet nikare di doza xwe de bi ser bikevin.

DÜZGÜN DENİZ



NÇM'ya ku di sala 1991'ê ve li Stenbolê vebûbû û çalakiyên xwe didomand, bi şahiyekê bar kire cihê xwe yê nû. Gelek sazî û kesên wekî Claudia Roth, Şanar Yurdatapan, Kemal Parlak, Eren Keskin eleqe nîşanî vekirina cihê nû ya NÇM'ê dan. Yek ji wan kesên ku nehatibûn, lê çeleng şandibûn jî İbrahim Tatlıses bû.

NÇM bar kire cihê xwe yê nû

Roja 3'yê reşemiyê li ser Cadeya İstiklalê Navenda Çanda Mezopotamya beşdariya nêzî 1000 kesî ve çû cihê xwe yê nû. Di nav beşdaran de ji Partiya Keskan a Alman Claudia Roth, Zimanzan Feqe Hüseyin Sağnıç, Serokê Estîtuya Kurdî Şefîk Beyaz, Faik Bulut, Şanar Yurdatapan, Necmettin Çobanoğlu û pir rewsenbîr hebûn.

Şahiya vebûnê bi axaftina rêvebirê NÇM'ê Süleyman Gültekin dest pê kir. Gültekin qedexeyên li ser çand, huner, folklorê kurdî bi bîra beşdaran xist û axaftina xwe wiha domand: "Emê li vî cihê xwe yê nû xebatên xwe, çand û hunera xwe bi rehetî pêşkêşî gelê xwe bikin û zordestiya dewletê ya li ser çand û hu-

nera me têk bibin."

Feqe Hüseyin Sağnıç jî bi axaftina xwe ve bala gel kişande ser xwedî lêderketina saziyên kurdî û girtina Seroka NÇM'ê Nuray Şen. Wî daxwaza xwe bi vî awayî anî ziman: "Heke em li saziyên xwe xwedî dernekevin, dewlet wê zêdetir bi ser me ve were."

Parlamentera Keskau ya Parlemantoya Ewropayê Claudia Roth, berî ku derket da Feqe Hüseyin Sağnıç. Roth wiha axivî: "Mirovekî ku ez pir jê re hurmetê dikim, birêz Hüseyin Sağnıç e, min destek ji wî re gul anîn, ew gul çiqas sor bin, ewqas zer û kesk in."

Parlamentera Keskan, axaftina xwe bi van gotinan domand: "Îro rojêke pir xweş e, li derve jî tav heye, ew tava îro

ya kurdan e. Daxwaza min ew e ku ev tav bibe tava ronahiya kurdan, pirsgrêka kurdan bi awayekî demokratîk çareser bike, ji Tirkîyeyê re jî demokrasiyeke bi rûmet bîne."

Claudia Roth, balê kişande ser girtina Seroka NÇM'ê Nuray Şen û xwest însanên demokrat û aşîxwaz roja 15'ê reşemiyê herine mehkemeya wê.

Ji hêla dinê, pir kesan jî bi mesajên vebûna NÇM'ê pîroz kirin. Mamoste İsmail Beşikçi, Münir Ceylan, M.Can Yüce, Cîgirê Serokê HADEP'ê Osman Özçelik û gelek kesên din dengê xwe gihandin şahiyê. Komên NÇM'ê yên muzîk û şanoyê, bi stran û lîstikên xwe beşdaran coş kirin.

METİN AKSOY

Rojnamevanên kurd yekîtiya xwe ava dikin

Bi serkêşiya hinek rojnamevanên kurd, li derveyî welêt yekîtiya rojnamegerên kurd tê avakirin. Li gorî agahiyên ku ketine destê me, ji bo avakirina Yekîtiya Rojnamegerên Kurd, rojên 17-18'ê reşemiyê li bajarê Kölnê konferansekê tê lidarxistin. Xebatê tene kirin ku li ser bername û rêzikên yekîtiyê lihev kirinek çêbe û amadekariyên ku ji demeke dirêj ve bi destê Komîteya Amadekar dihatin meşandin, bigihîjin encamê.

Di nav kesên ku serkêşiya vî karî dikin de, navê Günay Aslan, Mehmet Aktaş, Selim Ferat, Faysal Dağlı, Hüseyin Savaş derbas dibe.

Ji aliyê din ve tê ragihandin ku gelek weşan, sazî û rêxistinên kurd piştî didine vê çalakiyê. Di nava wan weşan û saziyan de navên: MED-TV, DEM (Ajans), Özgür Politika, Demokrasi, Newroz, Roj, Azadiya Welat û hwd. derbas dibin.

Ji bilî van kes û saziyan, ji 150 rojnamegerên kurd re dawetname hatiye şandin ku tevî vê çalakiyê bibin.

Di vê xebatê de tiştê ku bi baldarî li ser tê sekinîn jî, pêkanîna saziyeke demokratîk, neteweyî û pirdeng e. Ji ber vê yekê beşdariya hemû rojnamegerên ji derdorên kurd ên ji hev cihê tê xwestin.

Navenda Nûçeyan

Netîceya Sempozyûma Enstîtuya Kurdî ya li Hîltonê

Agirbest divê du alî be

Di pey agirbesta PKK'ê ya dawîn de ku yek alî hate ragihandin, careke din bi awayekî xurt meseleya kurdan kete rojevên dewletên Ewrûpayî, rêxistin, sazî, partî û kesên demokrat û aştxwaz; çî li welêt û çî jî li derve. Bi mebesta ku komara tirk jî agirbest ragihîne û gelşa kurdî bi şeweyekê demokratîk û aştiyane bê safikirin, çalakî tene lidarxistin. Çalakiya dawîn jî roja çarê vê mehê ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve hate pêkanîn.

R. DILOVAN



Ji aliyê çepê ve; İsmail Nacar, Bahri Zengin, Altan tan, Akın Birdal û Kemal Baysal

Pîştî agirbesta PKK'ê, çî li derve û çî li hundir, aştxwaz dengên xwe bilind dikin. Di 28'ê rêbendanê de li Stenbolê, li Otela The Marmarayê konferansa aştiyê hatibû lidarxistin, di 4'ê reşemiyê de jî, dîsa li bajarê Stenbolê, li Otela Hîltonê ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve sempozyûmeke ji bo "Çareserkirina Problema Kurdî bi Şeweyeke Demokratîk û Aştiyane", hate li darxistin. Nêzikî hezar mirovî beşdarî vê sempozyûmê bû. Di nav beşdaran de ji derdorên cihê rojnamevan, zanyar, nivîskar, sendikavan û parlementer hebûn. Hemû beşdarên sempozyûmê, diyar kirin ku agirbesta PKK'ê ya yek alî ji bo gelê kurd û tirk fersendeke mezîn e û divê ev derfet ji dest neçe û dewlet jî şertên agirbestê bi cih bîne. Ev sempozyûma ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve hatibû lidarxistin saet di dehê serê sibê de dest pê kir û heta pêncê êvarê dom kir.

Daneşîna berî nîvro, di bin serokatiya nivîskarê me Altan Tan de dest pê kir û di vê daneşînê de Serokê Rêxistina Mafê Mirovan (KMM/İHD) Akın Birdal, Nivîskar û Serokê Komîteya Aştî, Biratî û Hevgirtinê İsmail Nacar, Parlementerê RP'ê yê Stenbolê Bahri Zengin, Sekreterê Giştî yê Konfederasyona Sendikayên Karkerên Şoresger

(DİSK) Kemal Baysal û Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik axivîn.

Problema kurdî dayika hemû probleman e

Di destpêka daneşînê de Altan Tan axivî û wiha got: "Êdî em dev ji gilî û gazinan berdin, gilî û gazin di cihê xwe de ne, rast in, lê divê em bêhtir li ser formulên çareserkirina problemê rawestin û ji bo çareserkirinê, pêşniyazên xwe deynin holê." Piştî van gotinan Altan Tan, mafê axaftinê da Serokê KMM'ê Akın Birdal. Akın Birdal, di axaftina xwe de bal kişande ser agirbesta PKK'ê û xwest ku dewlet jî bersiva agirbestê bide. Birdal li gotinên xwe ev zêde kirin: "Muhatabê vî şerî li vir in gelo? Devlet li vir e? Wê pêşniyazên me li ber çavan bigire? Li vir e lê, ne ji bo çareserkirina problemê, ji bo ku binihêre ka wê kî çî bibêje, da ku der heqê wî de li Dadgeha Ewlekariyê dozê veke..."

Sekreterê Giştî yê DİSK'ê Kemal Baysal jî xwest ku dewlet rîayetî şertên agirbestê bike û got: "Êdî kes tehemûla jiyana bi vê problemê re nake, divê dewlet were guhertin. Problema kurdî, maka hemû problemên vî welatî ye."

Serokê Komîteya Aştî, Biratî û Hevgirtinê İsmail Nacar, di peyvîna

xwe de zêdetir li ser bêbaweriya ku di navbera kurdan û dewletê de heye, sekinî. Li gorî Nacar, ne dewlet li agirbesta PKK'ê ewle ye, ne jî kurd baweriya xwe bi dewletê tînin. Kurd dibêjin, "Dewlet li pey tunebûna me digere." Nacar ji kurdan xwest ku xwe bi derdorên marjînal ve girê nedin, bi îslamiyan re, bi burjuvazî re û çep û rastên tirkan re têkiliyê deynin.

Mebûsê Partiya Refahê (RP) Bahri Zengin, sedemê vê problemê wekî nîjadperestî û bêoliya dewletê da nîşan û xwest ku dewlet were guhertin.

Daneşîna piştî nîvro jî dibin serokatiya rojnamevan Ragıp Duran de, bi xwendina mesaja A.Melik Fırat dest pê kir. Di vê daneşînê de jî Prof. Doğu Ergil, Prof. Mahir Kaynak, Mebûsê CHP'ê yê Stenbol Ercan Karakaş, Sekreterê Sendikaya KESK'ê Faysal Özçift û Serokê Enstîtuya Kurdî Şefik Beyaz, li ser çareserkirina problema kurdî dîtin û pêşniyazên xwe anîn ziman.

Heke derî neyê vekirin, wê were şikênandin

Faysal Özçift piştî ku xwest dewlet bersiva agirbestê bide û axaftina xwe wiha domand: "Ji bo aştiyê divê em berxwedaneke tevayî bidin. Ev şer bi

nanê karkeran, bi canê zarokên karkeran, tê meşandin. Em dê kampanyayê kê li dijî vî şerî vekin û em dixwazin her kes piştgiriya bide vê kampanyaya sendikaya me."

Doğu Ergil jî xwest ku berî her tiştekî têkoşîna çekdarî li ser esasên mafê mirovan were bicihkirin. Ergil di axaftina xwe de diyar kir ku ji sala 1880'an vir de, her sal li ser welatê kurdan ji aliyê wezîfedarên dewletê ve rapor tên amadekirin û ev rapor bi gotina "Divê ev der werin îslahkirin" diqedin û raporên ku van raporên taqîb dikin jî, bi gotina "Bêasayîşbûna van deran ew e ku berê nehatiye îslahkirin." Ergil, piştî van gotinên xwe wiha got: "Di problema kurdî de telefonê lê daye, lê daye bes kesî ahîze hilnedaye."

Tenê di wexta hîlbijartinan de hildane, lê nebirine ber guhê xwe, careke digirtine.... Lê îro li derî didin, divê derî were vekirin, heke na, wê derî were şikênandin!"

Mahir Kaynak jî di axaftina xwe de li ser pîrsekê got "Ku gelê kurd bixwêze, dikare ji xwe re dewleteke serbixwedane damezirîne û tu kes jî nikare bibe a teng."

Di dawiyê de Serokê Enstîtuya Kurdî Şefik Beyaz, pêşniyazên Estîtuyê ji bo çareserkirina siyasî û demokratîk hatibû amadekirin, xwend.

Hinek ji wan kesên navdar ku beşdarî sempozyûma Estîtuya Kurdî bûn: Haşim Haşimi, Nazmî Gür, Ahmet Gürbüz Ketenci, Bahattin Günel, Ali Rıza Dizdar, İhsan Aslan, İsmet Aktaş, Kemal Peköz, Ahmet Kaya, Ferhat Tunç, Koray Düzgören, Mehmet Metiner, Rasih Nuri İleri, Şakir Diclehan, İsmail Göldaş, Torî, Öner Yağcı, Sırrı Öztürk, Erdoğan Tatlav, Ragıp Zarakolu, Ayşe Zarakolu, Ahmet Zeki Okçuoğlu, Ümit Fırat, Mustafa Goyanî, Abdullah Kaya, Muzaffer Ünlü, İbrahim Korkmaz, Tomris Özden, Yurda Kaya, Feqe Hüseyin Sağnıç, Eren Keskin, Mehmet Ali Eren û Selim Okçuoğlu.



Danezana encamnâme

1) Agirbesta ku PKK'ê yek alî diyar kir, di pêvajoya çareserîya demokratîk û aştiyane ya doza kurdî de derfeteke girîng e. Divê agirbest bibe dualî.

2) Doza kurdî, doza hebûn û jiyana gelê kurd bi nasnameya xwe ye. Zagonên ku li ber azadiya derbirina (îfade) ramanê û serbestiya rêxistinê dibin asteng, bi vî awayî jî, rê li ber niqaşkirina meseleya kurdî digirin, divê bên guherandin. Pêwist e ku hemû raman û rêxistinên li derveyî şidetê serbest bin.

3) Li Tirkîyeyê her cure bîr û bawerî divê di parlamentoyê de bê temsîlkirin. Lewre jî zagonên der barê partiyên siyasî û hîlbijartinê de, pêwist e cihê xwe bidin zagonên demokratîkî.

4) Hewce ye sîstema cerdevanî û rêveberîya ne-asayî ji holê bê rakirin û cerdevan bi avakirina gundên ku şewitandin bên wezîfedarkirin.

5) Divê mertalê destnedanê ji bo mebûsên ku peywendîya wan bi karên wekî kuştinên bêdarizandin, îşkence û binpêkirina mafên mirovan re çêbûye û generalên cuntayê, bê hilanîn.

6) Di doza kurdî de ku êdî bûye meseleyeke navneteweyî, muhatabê gelê kurd dewlet e.

7) Tirkîye, pêwist e rûmetdayîna mafên mirovan ku wekî pêdiviyeye demokrasiya nûjen tê dîtin, nas bike.

8) Divê pêdiviyên nasnava neteweyî ya kurdan bê nasîn û di zagona bingehîn de jî ew rastî bê tesdîqkirin.

9) Pêwist e berpirsên kuştinên "kiryar nediyar" bên dîtin, kesên ku ew kar kirine, tevî yên ku ji kirinên wekî îşkence, cinayetên bêdarizandin, bên eşkerekirin û pişt re bên darizandin.

10) Aliyê kurd jî, divê bi tevî çepgir û rastgiran, îslamî û sosyal demokratên civatê, daxwazên xwe yên aştiyane bîne zimên.

11) Ji bo pêkhatina aştiyeye mayinde pêwist e di navbera her du aliyên de atmosfera bihevewlebûnê çêbe.

12) Têgîna hemwelatîyê ku hebûna çand û gelên cuda nas nake, divê ji nû ve bê tarîfkirin.

13) Dewlet tevî hemû sazî û dezgehên xwe divê, bi naverokeke demokratîk ji nû ve bê sazîkirin.


14) Di navbera gelê kurd û gelê tirk de tu arîşeyên in, bes problem di navbera dewletê û gelê kurd de ye.

15) Ji bo safîkirina doza kurdî, demokratîkbûn pêwist e.

16) Divê dev ji politikayên pişafîtinê bê berdan, tadeya li ser çand û zimanê kurdî bê rakirin, imkana geşedan û pêşketina wan bê afirandin.

Altan Tan (Nivîskar-Rojnameger)
Akın Birdal (Serokê IHD'yê)
İsmail Nacar (Nivîskar)
Bahri Zengin (Mebûsê Stenbolê, ji RP'ê)
Kemal Baysal (Sekreterê Giştî yê DİSK'ê)
Osman Özçelik (Çigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê)

Doğu Ergil (Akademisyen)
Ragıp Duran (Rojnameger)
Mahir Kaynak (Şewirmendê MIT'ê yê berê)
Ercan Karakaş (Mebûsê Stenbolê, ji CHP'ê)
Siyami Erdem (Serokê Giştî yê KESK'ê)
Şefik Beyaz (Serokê Enstituya Kurdî ya Stenbolê)



Ji serî heta dawiyê, çîroka kişandina fîlmekî

1 - Fîlmek çawa tê kişandin, di kîjan qonaxan re derbas dibe, mirov kare bibêje ku her kes vê yekê meraq dike. Di vî rêzenivîsê de, ji destpêkê heta ku fîlm derdikeve pêşberî temaşevanan, ezê xebatên ku tên kirin ji we re vebêjim.

Pêşî çîrok: Ji bo ku dest bi kişandina fîlmekî bê kirin, pêwist e fikreke sereke hebe ku mesajeke mirov dixwaze bigihîne cemawerê. Fîlm pêwist e li dor ramanêke sereke bê honandin. Em bibêjin hûn dixwazin biratiyê ji xwe re bikin mijar, ji bo ku mirov vî temayê bi şeweyê baş ragihîne, divê kesên ku tên niqandin, baş li mijarê bînin. Ev kes lehengên fîlm in. Hewce ye ew kes wisa bînin niqandin ku mesaja we bi riya herî kurt, lê bi şeweya herî baş bigihîje bîneran. Niqandina lehengên sereke ji du netewe, an malbatên ku dijminatî di navbera wan de heye û xwîna hev rijandine, figura ku bi hêsanî bê hişê mirovan e. Gelo divê lehengê me ciwan be an kal be; jin be an mêr be? Ji van kîjan herî zehf ji dozê re xizmetê bike, divê bê niqandin.

AHMET SONER

Bi vî awayî çîroka fîlm û karakterên wî di serê mirov de çêdibin. Kesê ku wê senaryoyê binivîsîne, lehengan li cih û warên cur bi cur digerin, wan kêfxweş dike, xemgîn dike, dixwe nava gir û pevçûnan û di dawiyê de wan li hev tîne. Çîroka ku hestîya pişt fîlm pêk tîne, tê bipêşxistin; kî wê çî bike, çî bibêje, diyar dibe. Êdî mirov kare dest bi nivîsîna senaryoyê bike.

Senaryo: Dema çîroka fîlm, lehengên wî, cihên ku ew lê dijîn, derket holê, senarîst êdî dikare dest bi nivîsandina senaryoyê bike. Senaryo bi piranî deqeke ji 100 rûpelî pêkhatî ye. Di vî deqê de wê kî çî bike, çî bibêje, kûr û dûr tê de cih digire. Dema yek senaryoyê bixwîne, çî listikvan, çî kameraman divê karibe mijara fîlm bîne ber çavên xwe. Cihê ku bûyer lê derbas dibe, serdema bûyerê, peywendiyên di navbera kesan de, divê wekî yên romanekê, bi zelalî bînin fêmkirin.

Dema nivîsandina senaryoyê diqede, ji ber tê girtin ango tê kopîkirin û li kesên ku wê di kişandina fîlm bixebitin, tê belavkirin.

Ekîp: Ekîba fîlmekî ji van koman pêk tê:

Koma rêveber: Rejîsor, alîkarê rejîsor, katibê domdariyê.

Koma karê dîmenan: Rêveberê dîmenan, kameraman, alîkarê kameraman û wênekaran
Koma karê ronahiyê: Rêveberê ronahiyê û kesên alîkar

Koma derhêneriyê: Derhêner û kesên alîkar

Koma setê: Amîrê setê, teknîsyenên setê.

Koma dekor û kostûman: Rêveberê hunerê û kesên alîkar

Ji bilî van, kesên mîna makyajvan û kuafor jî di nava ekîba fîlm de cih digirin. Hejmara kadroya listikvanan, ku ji serlistikvanan, listikvanên rolên alîkar û figuranan pêk tê, li gorî hewcedariya fîlm diguhere. Ev hejmar ji kesekî heta hezar kesî diguhere, lê bi piranî di fîlmekî de hejmara listikvanan di navbera 30 û 80 kesî de ye. Heke wê fîlm bi deng bê kişandin, divê em koma deng jî têxin nava vî ekîbê. Ev kom jî, ji endazyarê deng, kesên ku mikrofona digirin û ji kesên alîkar pêk tê. Bi vî awayî hejmara ekîba fîlm herî kêr dibe 20, herî zehf jî digihîje 50 kesî.

'Ayikê bizina kol ji ya bi qiloç re namîne'



Îro li Tirkiyeyê rojnamevanîti tê pirsiyarkirin; bi taybetî bi "krîza Girava Kardakê" vê yekê bi xurtî di rojevê de cihê xwe girt. Wekî tê zanîn, qayde û normên pîşeya rojnamevanîtiyê jî hene. Rojnamevan tevî rêxistina xwe gelo çiqas rîayetî wan dikin? Li hemberî rûdanan çiqas bêteref dimînin? Exlaqê rojnamevanîtiyê li pêş in an berjewendên neteweyî? Pirsên wiha li hêviya bersivan in. Nivîskarê me İsmail Göldaş bi vê nivîsa xwe ya der barê bûyera Şêx Seîd de, wêfên rojnamegeriya tirk radixe ber çavan û Zana Farqînî ew li kurmancî wergerand.

Dîrok, 28 pûşper 1925; li Amedê şev e. Girtîgeha Amedê, li ber Deriyê Siwêrekê, 47 sêpê di tariyê de rastkirî ne û xew neketiye çavê tu kesî. Rojnamevan di nav keftû-leftê de ne. Ji wan re destûr hatiye dayîn ku bikevine hundirê girtîgehê. Şeva ku îdam wê pêk were, şeva ku 28'ê pûşperê dewrî roja 29'an dike, ye. Li Amedê, jinên zabit û karmendan (memûran) jî raneketiye, hatine temaşeya daleqandinê. Zêr û ziberên xwe, bi xwe ve kirine, xwe xemilandine û mantoyên xwe jî li xwe kirine.

Şêx Seîd, di hicrika xwe de bi Mudurê Girtîgehê Osman Beg re dipeyive. Li ser deftera ku rojnamevan dirêjê dikin de, nota "Qet bi ber daleqandina xwe mekeve" dinivîse. Wext, nivê şevê ye. Bayeke nermik û sivik tê. Dîl, bi hev û din ve hatine girêdan. Kesên ku hatine temaşeyê, li dora sêpiyan in... 47 mirov di tariya şevê de dimeşin. Zabit û pîrekên wan li wê rewşê temaşê dikin. Siya 47 sêpiyan, li tariya Amedê hatiye xêzkirin. Zabit û pîrekên wan, dora Şêx Seîd çeper kirine. Şêx Seîd Efendî, rawestiya, li Ali Saip zivirî û wiha got: "Roja mehşerê ez û tu emê muhake-me bibin." Pişt re bi aramî û bi sergirani "Wê ayikê bizina kol ji ya bi qiloç bistînin," got.

Şêx Seîd bi serbilindî diçe ber sêpiyê

"Di wê demê de dest bicihanîna fermânê hatibû. Leşkeran, mehkûm teko teko derdixistin ber sêpiyê. Lê gel (!) bi xwe dixwest şêxan daleqîne, pevdîçûn dê kê kîdaleqanda." Her ku yek dihate daleqandin, jinên zabitan çepilkên xwe li hev didan. Pîrekên zabitan, keç, karmendên ku hatibûn temaşeyê, germ û bi heyecan bûn. Şêx Seîd Efendî derxistin ber sêpiyê, bi awayekî aram çavên xwe li derdorê ge-

rand. Kursî, bi pehînekê ji bin piyên wî wirwirandin, gewdeyê wî kete valahiyê. Jin û zarokên zabitan, wekî ku hatibin temaşeyê mezîna qîrên "qehr bibe" didan. Gelê Amedê jî vekîşayabûn malên xwe, destên xwe ber bi asîman ve bilind kiribûn û dua dikirin.

Tava serê sibehê, li serê 47 dîlên kurd dida, ku serê wan ketibû ber wan. 29 pûşper 1925, êdî bûbû sibeh.

Bêşirove

"Amed, 29 (ji nûçevanê me yê taybet)-Do, bi şev saet li duduyan, li ser biryara Dadgeha Rizgariyê ya Rojhilat (Mehkemeya Îstîklalê ya Şerqê) Şêx Seîd û 46 hevalên wî hatine îdamkirin û bi vî awayî ferman bi cih hatiye anîn. Tafsilatên wê li jêr in.

Saet di duduyan de, me Seîd û 46 hevalên wî daleqandin û em bi şûn de vegeryan. Em dibêjin me ew daleqandin. Ji ber ku zabitên me yê rewşenbîr, leşkerên me yê ku di oxira îdeala welêt de şer kirine, gel û heta pîrekên me, doza van xayînen welêt gav bi gav taqîb kirine û aliyê pêkanîna hikmê înfaza wan jî kirine. Mehmetçik (ji leşkerê tirk re wisa tê gotin) kindir ji nav Dîjleyê kişandin. Şêxên ku bi sedsalan stem (zîlm) û tehdeya li gel dikirin, cara pêşîn bi qehr, lê bi biryara şoresên me yê adil hatin cezakerin. Dadgehê jî, biryara rakirina tekeya û zaviyeyên li virê da û ev yek bû sebeb ku, welatparêzên şoresger bi çepikên xwe yê ji dil, hawir bihejînin û gûn û rengên şêxan biçilmise û di rû û çavên wan de ji xwîn nemîne.

Ez di loceya çapemeniyê de me (Li gorî vegotina rojnamevan, wisa dixuye ku ji loceya çapemeniyê li bûyerê temaşê dike, Î. G). Guhdar, ji her demê bêhtir û ji aliyê jinan qet deng dermediket (...)

Reîs Mazhar Müfit Beg, piştî gotara xwe ya manîdar, fermana "Van mehkû-



●12'ê reşemiyê 1983

Li Parisê 12 rewşenbîrên kurd Enstîtuya Parisê ava kirin. Avakarên Enstîtuyê ev in: Îsmet Şerîf Wanlî, Cegerxwîn, Kendal Nezan, Yilmaz Güney, Ordîxanê Celîl, Heciyê Cindî, Hejar, Qanatê Kurdo, Remzî, Osman Sebrî, Tewfîq Wehbî û Nûredîn Zaza.

●13'yê reşemiyê 1925

Birayê Şêx Seîd, Şêx Tahir dema ku bûyera Pîranê dibihîze roja 10'ê reşemiyê dest datîne ser Postexaneya Liceyê. Roja 11'ê reşemiyê jî diçe Dara Hênê (Gencê) cem Şêx Seîd. Şêx Seîd jî dest datîne ser Qaymeqamiya Dara Hênê û Serokê Êla

Modan Feqî Hesen wekî qaymeqam destnîşan dike. Pişt re jî wî, Dara Hênê wekî paytexta Kurdistanê ya demdemî daxuyand.

●20'ê reşemiyê 1909

Kovara Amidî Sevda ji aliyê Alî Emîriyê Amedî ve li Stenbolê hate weşandin. Berpîrsê kovarê Alî Emîrî, xwedî jî Mehmed Şükrû ye. Kovar 6 hejmar dertê.

Nîşe:

Di hejmarê me ya berê de bi şaşî, di cihê Şêx Seîd de wênayê Diyap Axayê hevalbendê Ataûrk derketibû. Ji ber vê yekê em jî xwendevanên xwe lêborîne dixwazin.

AWIR



nandin. Ji bilî dengê piyên cemawer, tu tişt nayê bihîstin. Em ji Deriyê Siwêrekê derketin. Li pêş, siya 47 sêpiyan xuya bû. Em rastî Komutanê Kolordûyê Mürsel Paşa, Walî Mithat Beg, ji endamên dadgehê Lütfü Müfit, mebusên Amedê Cavit û Şeref Beg, çend zabit û gel hatin. Li pey jî, dijminên millet, welat, nûti û pêşketinê, ku gihabûn wê bawerîya kesên ku tirkekî bikuje wekî 70 gawir kuştibin, dihatin. 110 roj berê, li eynî cihî kesên ku mehmetçikan şerjê dikirin, çî qedereke pîroz e, dîsa ew kes di bin sungûyên mehmetçikan de diçûn cezayê kirinên xwe yê xerab dikişandin.

Dora Şêx Seîd, jê hate standin. Di vê navê de, me dîmeneke welê dît ku têra xwe em mexrûr û bi heyecan kirin û sînga me nepixand. Di nava gel de pîrekên zabitan jî hebûn. Jinên nas ên vî welatî, ku di oxira vî walatî de bêteredût bavên xwe, lawên xwe dane, hatibûn dîtina ku bê çawa mafê xwîna birayan tê standin. (...)

Îşlikê Şêx Seîd lê kirin. Bêdeng meşiya û bê biaxîn hate daleqandin. Dema ku hilma xwe ya dawîn da, hawir ji ber çepîkan hejiya. Pîrekan bi qîra ku ji dilê wan diqetiya "qehr bibe" digotin. Di bin guhê min de dengê: "Kanê kera-metên wî, benê wî jî neqetiya", digot.

Heta ku Seîd hate daleqandin, 20 kesê din çûbûn sêdarê. Ew gelê ku hatibû temaşeyê, ji bo ku ew bi xwe kindir bikine stûyê wan, bi hev re şer dikirin.

Leşkerekî şêr, bi xwe kindir xiste stûye Şêx Alî û kişand... "Te xwîna birayên min ên ku şehîd ketin, da", got.

Pişt re li ser navê matbuat, balafirvan, muhaberevan û şofêran, ji aliyê yekî ku mensûbê vê grûbê bû, şêxek hate daleqandin. Gava wî ew daleqand, dengên "tu hebî" û qêrîna jinan "her bijî" bilind bûn û jê re çepik hatin hingaftin.

Millet bi destê xwe, ceza da wan kesên ku dixwestin welat parçe bikin û rê li ber îdeala cumhuriyetê bigirin. Her kes, bi his û pêjnên kûr ên welatparêziyê bi şûn de vedigeriya. Di cîhanê de zewqa herî mezin ew e ku mirov teceliya heq, standina heyfa ayikê stembaran (mezlûman) bibîne û tu tişt nîn e ku bi qasî vê yekê ruhê mirovan mest bike.

Aha me teceliya heq dît.

NÎŞE

*Son saat, 30 Haziran 1341 (1925, s 1 Sadik Albayrak s 67)

**Ji metnê ku hatiye veguhastin, hin xal jê hatin derxistin, lê bêtî ku maneya nivîsarê xera bibe. Parçeyên din jî wekî xwe man. Nûçe, întibahên nûçevan dide ku li cih, bûyer vekolaye.



ÇAVDÊRÎ
Bênamûsiya
hezar salan

AMED TÎGRÎS

Dema mirov li ser dîroka Kurdistanê hûr û kûr dibe, dibîne ku ji hezar salan heta niha hinek mîr, eşîr, tarîqat, axa û hinek kesan xwe ji bo nav û dengên xwe, ji bo mal û pereyan an xwe firotine an jî spartine dijmin. Ev xwefiroşî û siyaseta erzan ji Îdrîsê Bedlîsî dest pê dike û heta îro jî tê. Ji bo ku Osmanîyan Îdrîs bikin Mîrêmîranê Kurdistanê, wî jî hemû mîrên din îkna kirin û xistin bin bandoriya Osmanîyan.

Îro jî rewş wiha ye. Zeydan û Bucak li Parlemantoya Tirkîyeyê bûne serokcehş û ji bo berjewendiyên xwe piraniya eşîr û derdorên xwe kirine ceşş. Ew bi çek kirine û li dijî gelê xwe bi kar tînin. Hîkmet Çetîn û Cewherî jî bi awayekî nûjen serokcehşîtiyê dikin. Gelek kesên din jî her wiha wekî wan di nav çerxa dewletê de ne.

Gelo ev hemû ji bo çî ye? Ji bo nav, kariyer û gezeke nan e ku li dijî gelê xwe dixebitin. Çî qezenc dikin? Zarokên xwe xwedî dikin an jî dewlemend dibin. Xanî, vîla, erd û araziyan dikirin. Li bankayan pereyan didine ser hev. Ka şan û şeref, mal û milkê Îdrîsê Bedlîsî li ku man? Ka ew mal û milkên axa û mîrên din ên hevkarên Roma Reş? Çî bi wan hat? Tiştên ku ji wan man an jî li dû xwe hiştin, bi tenê bêşerefiya sed salan e. Ji neviyên wan, hinek niha nikarin pariyek nan jî bibînin. Çî bû? Dewletê ew di wê demê de bi kar anîn û pişt re dema wan tije bû. Rola wan nema. Ew girtin û avêtin kuçeyê. Heta dest dan ser mal û milkên wan û ew girtin û şandin mişxetiyê.

Jiyana mirovan kurt e, zû tê û diçe. Lê, xayîntî û cheştiya neteweyê dikeve dîrokê û heta ku dinya hebe dimîne. Rast e, mal û milk jî dimîne, lê ji kê re?

Mirov nikare van tiştên ku me li jorê got, ji piraniya kurdan re bibêje an bike mal. Ji ber ku sînorekî mezin û dîwarekî bilind di navbera kesên xayîn, çehş, xwefiroş û kesên normal de heye.

Lê, tişteke heye ku rastiyê venaşêre, ew jî kariyer û pariyê nan e. Yanî xwedîkirina zarokan e. Belê, ji bo ku mirov jiyana xwe bidomîne divê mirov xwarin û vexwarinê bibîne. Li mal û zarokên xwe mêze bike. Lê, çawa? Jixwe mesele di bersiva "çawabûnê" de ye. Heger mirov li meseleyê bi çavekî neteweyî û demokratîk binihêre, wê demê ev rewş piçek tê guhertin û zelal dibe.

Jiyan, hemû ne xwarin û vexwarina malbatî ye. Jiyan mal-batiya neteweyî heye ku ev di ser her tiştî re ye. Zarok û malbat di nav vê malbata mezin û pîroz de, bi tenê xelet e an jî dilopek e. Mirov çawa ji malbata xwe re dixebite, divê bêhtir ji malbata mezin yanî ji welatê xwe re bixebite.

Çawa her kurd, di rojê de çend saet bi karê xwe yê şexsî û zarokên xwe ve dadikeve, divê bi kêmasî ewqas jî, ji bo welêt dabikeve. Azadiya zarokên her kurdî, bi azadiya Kurdistanê ve girêdayî ye.

Divê neyê jibîrkirin ku koleyên modern ziktêr û bi serûguh in. Kole kole ye. Bi zikê têr û kincên nû kole ji koletiyê rizgar nabe.

man bibin", da (...) Ji jinan gelek jê rabûbûn, lê nedîçûn. Ji zabitan yekî "Gelî Xaniman herin", got. Gava ku destên kesên ku wê bihatana daleqandin, hatin kelemçekirin, salon vala bûbû. Bi tenê di locayê de em rojnamevan mabûn. Ronahiya çavên me we digot qet birq û birûsk vedidan. Em tişteki nabêjin. Em bi rewşa wan kesên ku bi biryara dadiyane wê cezayê xwe bibînin, mest bûbûn. Tev, di binê giraniya kirinên xwe yê xerab de diperpifîn. (...)

Osman Beg, bi domkirina lédana kelemçeyan li destê mehkûman, mijûl dibû. Niha ferman dan mehkûman ku bimesîn. Di serî de Şêx Seîd, di bin sungûyên Mehmetçikan ên şewqdar de, li kolana Amedê ya fireh bi rê ketin. (...)

Ez nûçeyên ku dê bidime rojnameya xwe, bi bêdeng dinivîsim. Di pey de, dîsa bi bêdengî nanê xwe dixwim. Di hundirê min de kêfxweşiyê bêterîf a ku paşverûyan (irticavanan) qehr dike heye.

Ez di deriyê girtigêhe de ketim hundir. Ji mêrdevanê derketin hafê. Şêx Seîd di odê de bi tenê ye. (...) Rahîşte cigaraya ku min dirêjî wî kiribû (...) Bayekî nermik û sivik tê, heyva ku ji nava ewrên firk derketibû, bi alikariya lempaya lokizê, li kesên ku diçûne siyasatgehê ronî dikir. Merasîm qediyabû, Şêx Seîd hildabûn navbera xwe. Salihê Hênî nav di hevalên xwe dida. Lawê Mustefa Mehmed, helalkirina xwe ji hevalên xwe dixwest. Heyva ku li ser bedenên kevnare yê Amedê derketibû û wekî ku bibişire, dibû şahit ku çawa edalet tê cih (...)

Şêx Seîd dibişjre, ji esmanê bi stêr û ala li sungûyên mehmetçikan, wekî ku nûr bê ho-

Ew

“...Dewletê îsbat kir ku çendî
xwedî hêzeke bi xezeb û dijwar e...”

Güngör Mengi

10 Berfanbar 1995 / SABAH

Ku şev di ser rojêke din de wergeriya û bi lez ber bi banga sibê ve diherikiya, çawa çêbû nizamim, yek ji wan hate rehmê, rabû “şevbixêr” da û çû... Derengê şevê civat belav bûbû, lê ew her du wekî ku li hev çûbine rikê, rûniştî mabûn, ranedibûn û ji xew çavên min venedibûn...

Bi çûna wî re diyar bû ku, yê din ji ew çend wext li ber rabûna wî mabû. Lewra piştî çûna wî, ev wekî ku min ji xerabiyeke mezin biparêze û rastiyeke bêşik bîne ziman, ji gotina xwe bawer, li min şîret kir: “Tu hay jê hebî, ew zilam ajan e!”

Ev xizmekî min bû, lê wekî yê din; min ew jî hê nas kiribû. Nizamim gelo min hewce bi vê şîretê hebû? Jixwe bi sebebeke ku min baş pê nedizani û piştî wextan ji hîn nebûm, di ser hatina ‘wî’ re hê deh deqîqe nebihuribû, ez lê ketibûm şikê... Pirsên wisa dikirin ku, mirov jê hêvî nedikir. Zanebûna ‘wî’, li gorî gundiyeke zêde bû, lê ne zanîneke întelektûel, jê zêdetir li ser jiyân, kar û kirinên mirovên politîk bû. Belkî zêdetir ji ber van pêzanînan ku lê nedihatîn, dilê min lê hatibû girtin û ji êvarê ve min pirsên wî yê bêhejmar bi “e...” an jî “na...” dibersivand...

Piştî gotina xwe, deqîqeyek tenê ji nesekînî, li xwe da rabû... Û çawa ku ew ji derî derbas bû û çû, min serê xwe danî xewê...

Êdî roj, na, ne roj, şev di ser de nedibihurî ku ew her du nehatana malê... Her ku bûbûya êvar û ez ji bajêr vegeyiyama, min ew, her du li mal rûniştî diditîn. Her du tenê bûna dîsa baş bû, ji bilî wan, gelek kesên din jî dihatin û piraniya wan xizmên min bûn, lê heta çend roj berê ku hê nehatibûm vî gundî, ez bi hebûn û tunebûna wan elam nebûm...

Wekî ku di çîrokên de tê gotin “Ez çi ji te veşêrim, ji Xwedê nayê veşartî...”, wisa her dan û êvar ku bi hev re dihatin malê, zêde ne bi dilê min bû. Axaftinên wan erzan bû, nêzikahiya wan û jiyânê, nêzikahiya wan û rewşa dinê ji min dûr bû. Lê dîsa jî, di nava wan de nerehetiya min, zêdetir li ser hebûna ‘wî’ bû...

Wekî ku bi hev şewirîbin; tev, lê ne bi hev re, yeko yeko ku fersend diditîn, devê xwe dianîn ber guhê min û li min eynî şîretê dikirin: “Tu hay jê hebî, bêbext e ew zilam, ajan e!”

Her ku ev şîret di guhê min de, bi pisepis dihat gotin, min di nava xwe de pesnê xwe dida, bi besimîneke xwe mezindîtî dibesimim û min ji

xwe re digot: “Te dît ku ez çi zana me, di nava çend deqîqan de min jê fêm kir, tê deranî bê ku ew çi kes e!”

Ji xwediyê şîretê re jî min ev bersiv dida: “Ez xwarziyê te me, meraq meke! Pê dizanim...”

Êdî ku yekî xwe ji bîr bikira, welaw lê neketibûya şubhê û ev şîret li min nekira, ez di nava xwe de aciz dibûm û min digot: “Serê vî zilamî naşixule, gêj e; ev çend sal û zeman e, di vî gundî de, li ber pozê hev in, lê hê jî tê demxistiyeke bê ku ew çi bêbext û fesadek e!”

Caran, yek ji mêvanan (we dît; ku min ji wan re got mêvan! Di wê malê de mêvan kî bû? Ew bûn, an ez? Her çend ku ez kurê malê jî bim, ew jî min bêhtir malî bûn û ez ji wan zêdetir mêvan...) çawa ku qenciyeke herî mezin li min bike û bibêje; vê qenciya min ji bîr meke, te, jê xelas dikim.. Û bi awayekî ku ‘ew’ pê nehîsî, ji min re çav dişkênand û digot: “Bû dereng, me xew jî li we herimand!” Û radibû...

Bi rabûna wî re çi bidil û çi bêdil,

isa her dan û êvar ku bi hev re dihatin malê, zêde ne bi dilê min bû. Axaftinên wanerzan bû, nêzikahiya wan û jiyânê, nêzikahiya wan û rewşa dinê ji min dûr bû.. Lê dîsa jî, di nava wan de nerehetiya min, zêdetir li ser hebûna ‘wî’ bû...

ê din jî li xwe didan radibûn... Lê ew jî cihê xwe ranedibû, beriya me ji wan re digot: “Oxir be, serçavan!”

Çi jî be ‘ew’ cîranê me yê herî nêzik bû, mala me û wî li ber hev, derî bi derî ve bû.. Ku bêhneke din rûniştî da dê çi lê bihata?!

Ji bo ku bi min re hevaltî çêke, çi jê dihat fikir, lê hevaltiya wî li derê ha, ez bi hebûna wî jî diqehirîma û di halê xwe de disincirîma... Caran, min digot; heye ku bi rastî jî nizanibe hebûna wî, çendî min ji eyarê min derfîne?! Belkî dizane, lê ji ber “wezîfa” xwe, xwe li nezaniyê datîne.. Çi reben e, lo!.. Çavê wî li xapandina min e, wekî ku ez, pê nizanibim!..

Erê! Te xapand û min jî dît!..

Her ku ‘ew’ gavek nêzikî min dibû, ez deh gav jê dûr diçûm, li pirsên

wî ker û lal dibûm... Gelo ev keda yekalî ku ji bo hevaltiyê dida bêsebeb bû? An jî qabil bû ku bi sebebekî baş bûya? Na, êdî şik tê nemabû. ‘Ew’ zilamekî bêbext bû! Ji tuxmê Beko bû!..

Ma li bajêr jî, ku ji gund gavek rê dût bû, ew kesên ku ‘ew’ nas dikirin, xwe jê nediparastin û eynî tiştî nedigotin?


Her êvar ku dihat û bi saetan rûdinişt ne derdekî bes bû; ku li hafa wî rûdiniştim û ji bêçarî jê re dibesimim, kes nizane bê ku çi barekî, ezabekî giran, ê ku nedihat kişandin bû... Êdî wisa bû, ku min nema karî ew bar û ezab hilgirta; çawa ku ew bihata, ez radibûm, derbasî odeya din dibûm, an min kitêb dixwend an jî li ser nivîsîna nûçeyekê dişixulim.

Niha ji min re wisa tê ku di navberê de sal û zemanên dirêj derbas bûne, lê bi temami sisê, te negot bila çar sal berê be. Bo çi ev du-sê sal ev çend li min dirêj tîn?!

Dibe ku zeman, çawa em pê dizanin; ne demeke ku di nav salan de hepiskirî be: Belkî herikîneke wê ya

din, çerx û felekeke wê ya din, ku em pê nizanibin jî hebe... Belkî di vê herikîn û çerx û felekê de, zeman tê dirêjkirin û kinkirin, tê zêdekirin û kêmkirin, kî pê dizane? Kinahî û dirêjahiya deh rojên ku yekî bi hevalekî xwe re, di meheke havînê de, li ber behreke şîn a zelal û geh bi soberiyan di nav avê de, geh li ber tavê, li bin siya daran, geşt û seyran bike û girtiyekî ku di zindaneke kûr û tarî de biborîne, dibe ku wekî hev bin? Yan jî; sî saniyeyê dawî, ku bi girtiyekî nûrinê re hevaltî dike, û niv deqîqeyê ku bi xewn û xeyalê yekî ku di himameke bi hilm û germ de, xwe dirêj-dike û di xwêdanê de mest bûye, ji xwe çûye, re hevaltiyê dike qabil e ku wekî hev bin?..

Di wê demê de her mirin li me zê-





dayî, şênî û cejna jiyane bû, her taziye û definkirin jî serhildan... Definkirin û taziye her û her di rengê serhildanan de man, lê roj bi roj pêkanîna wî zor û her ku çû ji zorê jî derket, hate eyarê neqabiliyê... Lê mirin...

Di her serhildan û çalakiyê de min, 'ew' didît...

Ew wiha bûn; ji mirovên rêzê cuda bûn, tim û tim li pêş, li ber hilma mirinê dimeşyan! Û xwe gavekê nedidan paş! Lê, ax ku ev ne rastiya wan bû; rastiya nava dilê wan reş û tarî, wekî qîr bû! Û xwefirofî bûn...

Piştî çendeyek di nav de bihurî, êvaran di kolanên bajêr de, di ber tekbîra "Bisimla" de, henekên ku nedihatî zanîn bê kî ne, bi dar û hesinan li serê xelkê didan. Gelek mirov bi vî rengî birîndar bûn, hatin ber mirinê... Û tiştêkî balkêş bû; piraniya wan mirovên birîndar mela bûn.. Têkiliyê wan melayên ku di ber tekbîra "Bisimla" de, bi dar û hesinan dihatin birîndarkirin, bi dewletê re ne baş bû. Danûstandina wan û dewletê bi hev re tune bû...

Dîsa evarekê, ku li xortekî dan û ew xort nefilitî, mir; êdî mirovkujan dev ji "Bisimla", ji dar û hesinan berdan û êdî li benda êvaran jî nediman: Nava rojê, di nivê bajêr de, lûla demançeya xwe didan ber serê qurban û bêkelam tiliya xwe ya eşhedê dikişandin... Piştî qurban li erdê, di nava xwînê de dirêj dibû, mirovkuj di nava nivê rojê de, li ber hezar çavên ku ji tirsan bizdiyayî û ne bi bazdan, bi gavên giran dimeşî û diçû, ji ber çavan winda dibû... Di wan rojan de, ez ji bajêr derketim, çûm bajarekî din. Piştî çend mehan, ku vejeriyam, di bajêr de kîjan nas û dostê ku min dîtî, bi yek gotinê li min şîret kirin:

"Nexwe gund, gund bêewle ye!..."

Li gund her tişt berepaş çûbû. Piştî bajêr, ewrên reş û tarî, ê mirinê, esmanê gund jî girtibûn û taya mirinê ketibû nav gundiyan... Li gund hê kesî nekuştibûn, lê te, kî bida xebardan; gotina wan a bi saw û tirs yek bû: "Ev minafiq çavsofî bûne, ev xwefirofî har bûne, tuyê bibîni ku ewê di vî gundî de xwînê birêjin! Kengê hebe; ev xwefirofî wê kuştinê çekin!"

Xizmê min ê ku cara yekemîn ji min re gotibû "ew ajan e", berî çend rojan bi wan re şer kiribû, wan jê re demançe kişandibûn, lê wî bi bêrê êriş biribû ser wan, demançe ji wan standibû û ew di nava heriyê de gevizandibûn...

Diya min, pesnê wî dida û digot: "Kurê birayê min mêrxas, fêris û egîd e! Di nava millet de serê wan tewand, xiste nizam çiyê wan! Lê, ew bênamûs jî, vê yekê danaqurtînin; an wê wî bikujin, an jî bidin kuştin!..."

Wekî bajêr; di gund de jî, mirinê di serê lûleyan de kemîn vedabû û gav bi gav li pey hemû kesan bû... Ji mirovkujan û mirovên wan pê ve, kesî nizanibû; gelo hetanî roj bibe êvar ewê bimîne an wê bimire... Jiyana mirovên bi xîret, hefsarê xwe qetandibû, li çerxa felekê siwar bûbû...

Êdî ku dibû êvar, mal ji mêvanan tijî nedibû... Berê ji mêvanan aciz dibûm, lê niha jî, tunebûna wan kefçika dilê mirov sar dikir... Piraniya gundi-

D

i wê

demê de her mirin li me zêdayî, şênî û cejna jiyane bû, her taziye û definkirin jî serhildan... Definkirin û taziye her û her di rengê serhildanan de man, lê roj bi roj pêkanîna wî zor û her ku çû ji zorê jî derket, hate eyarê neqabiliyê... Lê mirin... Di her serhildan û çalakiyê de min, 'ew' didît... Ew wiha bûn; ji mirovên rêzê cuda bûn, tim û tim li pêş, li ber hilma mirinê dimeşyan! Û xwe gavekê nedidan paş! Lê, ax ku ev ne rastiya wan bû; rastiya nava dilê wan reş û tarî, wekî qîr bû! Û xwefirofî bûn

yan êdî silava Xwedê jî li me nedikirin. Tenê 'ew' û xizmê min ê ku jê re digot ajan, dîsa her êvar dihatin. Na; nehlet li derewan! Hevalekî wî xizmê min jî dihat. Yekî bi gewdeyê xwe wekî dêw; bilind û gir bû, lê ji reşika çavên wî yên melûl diyar bû ku ew êdî ne bi dilê xwe dihat... Li aliyekî xîret û mêranî, li aliyê din tirs mirinê!.. Wekî mirovekî ku jora wî teht û zinar, jêra wî kaş û kendal be; nedizana çî bike, bi ku ve here... Halê wî ev hal bû. Hê jî berepaş neçûbû, paşgav neavêtibû, lê ji halê wî diyar bû, paşgava wî ne dîr bû... Tiştê min tê deranî: Ew li benda her duyên din bû, ku beriya wî, ew xwe ji malê bigirin û neyên, da ku mêranî(!) jê re bimîne. Êdî gotina wî ya "Min zêde aciz bikin, ezê bi riha wan şeytana bigirim û li nivê dîwar bidim, ku guhê wan bi dîwar ve bimîne!", kesî ji devê wî nedibihîst.

Tiştê ku ez ecêbmayî dihiştim ew bû; rews çendî bi xerabiyê ve diçû, 'ew' bêhtir bi bawer, bîr û biryar li dijî wan disekinî û digot: "Her ku mirov li ber wan bênamûsan serî bitewîne, bila mirov mirî be, sed carî çêtir e! Û min ahd daye: heta ku ez sax bim li ser rûyê dinyayê, wan ev gund zeft nekir! Ez vî gundî bi saxiya xwe, bi destê wan ve bernadim!..."

Ku min wî wiha bi bawer, bîr û biryar didît ez ji xwe û şubha xwe dikişim şikê; dibe ku ez xelet bim û bi şubha xwe li vî camêrî neheqiyê di-

kim? Pê re pê re jî min got "Na!" ev taybetiyeke wan e, mirov dixapînin, di hêla dijîtiyê de, ji hemû kesî bêhtir tûj xuya dikin! Heke na, wê çawa "wezîfa" xwe pêk binin...

Derengê şevê ku ew rabûn, ez ketim nav nivînan, lê heft car heram be, ku hetanî tava sibê xew bi çavên min ketibe... Germa havînê û kermêş ne bes bûn; mirik jî derdê ser derdan bûn! Ne dihatin dîtî û ne jî his ji wan dihat, tenê mirov bi xura laşê xwe ya dijwar, bi hebûna wan elam dibû... Qene kermêş di bin bayê perwenê de, bela xwe ji mirov berdidan, lê perwane jî, ji wan mîratê mirikan re nedibû asteng...

Ez danê êvarê ji gund derketim.

Ji bo herim bajêr; peya û di nav zeviya pembûyê de derbas bûm. Ev cara yekem bû, ku ez di nav zeviyeke pembûyê de derbas dibûm. Gozikên pembûyê ez ecêbmayî hiştim... Hilmeke germ û bişîrêz ê pîs pif dikirin dev û rûyê mirov... Gozikên pembûyê teva bi hev re, bi yek dev û wekî birîndarên xedar, bi nalînên kûr hilm didan û distandin.. Hetanî roja îro her şinahiyekê hênkahî dianî bîra min, lê van gozikên pembûyê, ev ramana min, bi carekê serobino kirin...

Vê zeviyê, bajar û gund ji hev vediqetand. Di navbera bajêr û gund de ev zeviya dirêj tenê hebû. Çawa ku min zeviya pembûyê xelas kir, ew hewayê germ, bi şîrêz û xenoq jî bi carekê hate birin...

Êdî nedîçûm gund, li bajêr, li mala pismamekî xwe dimam. Di bajêr de jî, ji bo nas û dostên xwe nebînim, di kolanên tenha de diçûm û dihatim û kêncar bi aliyê sûkê ve diçûm. Carekê ji nişka ve, di kolaneke tenha de ku ez û 'wî' leqayî hev hatin, nizanîm wî tê deranî an na, lê wisa li min hat; çawa ku yekî di nava min de cilê avêtibe derekê min, madê min xera bû... Lê ew wekî ku ne hefteyek berê em ji hev veqetiyabin; çawa ku hevaleyê wî yê kevin bim û ji riyêke dîr hatibim; bi şahî ez hembêz kirim û got:

"Ma tu ji vir neçûbûy, kengê hatî? Tê werî gund, ku tu werî; em bi hev re herin. Karekî min bi te heye, ji te re hinek gotinên min hene..."

Êdî ji bo min sekina di vî bajarî de, ne ji xêrê re bû...

Min got: "Tu li cihê minibusên gund li benda min bisekine, karekî min heye, ezê niha bêm..."

'Ew' ber bi cihê minibusên gund ve çû, ez jî bi aliyê otogarê ve.. Ew bila li wir li benda min bimîne; min bi lez bilêtek ji bo bajarekî din birî û pê re pê re ji otobos hat û ez lê siwarbûm, ji bajêr derketim...

Piştî ku mehek di nav re derbas bû, di rojnamê de, nûçeyek ku li ser gund hatibû nivîsandin bala min kişand: Li gund jinek kuştibûn, lê min bi nav û paşnavê wê, tê dernexist ku kî ye û min bazda têlefone... Kuştî jina pismamekî 'wî' bû... Şifêrê minibusêke gund bû. Yekî keçel, gir û heta bibêjî xurt û mêrê du jinan bû. Dema bi çek hatine, jina wî ya mezin, ku bi zaro, giran bûye, xwe avêtîye ber mêrê xwe û bi wan ve zare zar kiriye: "Ji bo Xwedê û pêxember!..."

Dumahîk Rûpel 10

Mîrê min

Di nava gelê me de gelek klam û stran hene, ku li ser serhildan û raperînên me hatine gotin. Em dikarin bibêjin ku ew, dîroka me ya nivîskî ne û li benda berhevkirinê ne. Bi şertê ku eslê wan neyê guhertin Der barê vê yekê de Dengbêj ZÜLFİKAR KORKMAZ klameke wiha da me. Em jî wê, bi hêviya ku dê bala we bikişîne diweşînin.

Ciyayê Kurê bi sê parsû ye, gelekî berz û bilind e. Di dîhara wî de du heb şehîd hene. Gundî, zarokên nexweş, keçên nezewicî, ji bo mirazê xwe diçin ser gora şehîdan. Bendan girê didin; pez û dawerên bawî li dor gorên wan digerin, êşa wan derbas dibe. Demekê, hinek dozên siyasî li min qewimîbûn, belkî bîst caran leşkeran ajotin ser min. Min berê xwe da Çiyayê Kurê. Ez bi vî awayî ji destên leşkeran xelas bûm. Rojekê li dîhara Çiyayê Kurê, ku gundê Şêx Seîd Qolhisar wekî neynikê dixuya, Qiyama Şêx Seîd hate bîra min. Li ser vê serhildanê, dayika min stranek got. Min jî ew nivîsand.

*Mîrê min, mîrê min, mîrê min
Sînga xwe daye ber gule û topa romî
Azadiya Kurdistanê, hêdî bajo Şêxê min.*

*Şêxê mino, dilê min di xemê de
Cemal Gürsel leşker rakir, borî lê da
Ordîyek leşker şandin bi Xînisê de
Destê Şêx Seîd, Xalîte Cibirî tevî çil giregirên
Kurdistanê girê dan, şandin bi Amedê de
Şêxê mino hatim, wî li yan e li Qolhisarê
Tibika polîsan, dewriyan û leşkeran e*

*Li Kurdistanê kilit kirin deriyê mizgeft û medresan e.
Çil giregirên Kurdistanê şandin Amedê, ber bendan e.
Şêxê mino diçim Qolhisarê, li hember e
Taca serê Şêx Elî kesk û zerê dara xurmê
Temamî alema sînga xwe daye,
hilkiriye bi zêr û bi zeber e.*

*Rêzanên wekî wan nabînim ku bikirim bi zêrê zer e.
Misto Kemal digot:
Xalîte Cibirî dilê min li yan e,
Qebûl bike anayasa Tirkistan e,
Ezê te, bikim alayreisê Kurdistan e.*

*Xalîte Begê digot:
Di anayasa tirkan de tune mafên Kurdistanê,
qebûl nakim vê zagona hanê
Misto Kemal tevî civata dorê, îdama Şêx Seîd, Xalîte
Cibirî, çil giregirên Kurdistanê, dan moran û maz-
bata ne,
Şandine Amedê, ber bendan e.*

*Êdî bawer nakim dinya bi dinya be,
Rêzanên wekî Şêx Seîd, Xalîte Cibirî ku li me rabin
Ku serkêş dewleta tirkan be
Kurdistan wekî keleka seravê wê li ba be*



Şêx Seîd Efendî

*Piştî şehîdketina rêzanan, di destê ereb û ecem
û tirkan de*

*Wê halê me çawa be?
Hêdî bajo, hêdî bajo, hêdî bajo, Şêxê mino
Sînga xwe daye ber gula topa romîyan
Azadiya Kurdistanê Şêxê mino, rom xayin e.*

Destpêk rûpel 8 - 9

Ew, bi mirinê hat şuştin û pak bû, lê em di bin şik û şubhên xwe de sertewandî man... Niha yên ku serê kaniya wan şik û şubhan digirin, dibêjin: "Hey bavo! Ku em çendî bi hêz û şiyan in!..." Û di nava kêf û şahiyê jehrîn de bi me dikenin... Di dû 'wî' re, ji şerman; zimanê kesî negeriya û di heqê wî de ne baş û ne xerab tiştekek negot.

Lê, hê ku peyva wê di devê wê de bûye, yekî gotiye "Bismilla, Laîlahêlillah!!!" û tiliya xwe yê eşhedê li ser tetikê şidandiyê... Gule li zikê jinikê ketiye, serê zarokê di nava zikê wê de bela kiriyê!.. Tenê gotiye: "Ji bo Xwedê qurtek av!..." Lê nekariye avê vexwe...

Û 'wî' tenê, bi serê xwe û bi darekî li mirovkujan qewirandiyê, êrîş bariye ser wan û ew mecbûrî revê kirine. Di gund de, hinekan pesnê 'wî' û vê mêraniya wî dane, lê piraniya gundiyan ev mêraniya 'wî' bi vî rengî şirove kirine: "Ew li 'wî' nadin, ji ber ku ew zîlamê wan e! Ne 'ew' yekî din bûya û wiha li wan biqewiranda, niha ew dabûn ber guleyan, kiribûn wekî seradê!..."

Lê di nav de gelek nebuhurî, 'wî' ev gotin vala deranîn û serê me gelek tewane ber me...

Pêşî di gund de, li birayê wî yê jê biçûktir dabûn, serî lê pelixandibûn. Birayê 'wî' di gund de dikandarî dikir û kesî gotineke tehl jê nebihîstibû... Xortekî milahîm û tim dev bi ken bû...

"Ku li min bixwe dabûna, ezê ev çend neqehiriyama, lewre ez li dijî wan im, ji min û wan re bêminetî bû! Lê, ji bo Xwedê bêjin; di vî gundî de, wan benamûsê xwefirotiyên dilrêş jî, ji devê birayê min, xebereke tehl û nexweş seh kirine?!"

Berî ku here bajêr, ji birayê xwe re derman bikire jî, wiha dibêje: "Meraq

nekin, ku ez nemirim, sax bimînim, tol û xwîna birayê xwe li erdê nahêlim! Lê ku bimirim..." Piştî peyva xwe ya dawî, bi qasê nîv deqîqe sekiniye û pişt re "Ku ez bimirim, wê xwîna min, tola min li erdê bimîne..." gotiye û çûye...

Hetanî li bajêr karê xwe xelas dibe, dibe danê êvarê... Dema ji bo vegeerê tê ber minûbusa gund û derî vedike ku siwar bibe, ji pişt xwe ve dengê yekî dibihîze: "Ev çî ye lo; mirov henekên wiha nake!"

Lê 'ew' di nava xwe û vî dengî de tîkiliyekê nabîne... Celadê wî, gavek li paş wî sekiniye, lûla demançê bi serê wî ve daniye û tiliya xwe li ser tetika demançê xwe dişidîne... Û çawa ku hatibe; wisa bê gotin û bêdeng, demançê di destan de, hêdî hêdî dimeşe, hewca bazdanê jî nake; li ber çavên bi tirs û bizdiyayî giran giran diçe, ji ber çavan wînda dibe... Ji devê yê ku di serî de, demançê di destê celad de henek dihesibîne, bi dengeke nizim "Min dikaribû nehiştê ku ew yek bibe..." dirije, lê ew deng bi guhê kesî ve naçe...

'Ew' bi mirinê hat şuştin û pak bû, lê em di bin şik û şubhên xwe de sertewandî man...

Niha ên ku serê kamiya wan şik û şubhan digirin, dibêjin: "Hey babo! Ku em çendî bi hêz û şiyan in!..." Û di nava kêf û şahiyê jehrîn de bi me dikenin...

Di dû 'wî' re, ji şerman; zimanê kesî negeriya û di heqê wî de ne baş û ne xerab tiştekek negot. Bes yekî ku lê neçû-

bû şubhê dema pesnê wî û mêraniya wî dida, ên ku lê ketibûn şubhê tenê bi kesereke kûr digotin: "Sebr û arama wî, bi sedan, bi hezaran car ji mêraniya wî zêdetir bû! Ya Rebî bêlome; ew tiştên me anî serê wî, ku hinekan bianiya serê me, niha her yek ji me bûbû benamûsekî herî mezin!... Çendî me, ew deh dida bi alê neyar ve, wî bi sebr û arama xwe ya bêserûbin, xwe ji neyar dîr kir, û bi baweriyê heşî li dijî neyar xebat kir... Werhasilê kelam; wisa li me anî, ku çawa se direyî, karwan dibuhurî li me hat!..."

Piştî çendeyêke din, min di rojnameyê de, ev car kuştina wî xizmê xwe yê ku cara yekemîn ji min re gotibû 'ew' ajan e, xwend. Ew jî, wekî wî, ji bo vegeerê gund li minûbusê siwar bûye, ku minûbus dikeve rê, li derekê du zîlamê ku di paldankê pişt wî de rûniştî bûne, ji şifer re dibêjin "Emê peya bibin." Dema peya dibin, yê dawî ku hê di nava derî de ye, ji ber xwe demançeyê xwe derdixe û vedigere... Dema gula ewil ku li sînga wî dikeve, bênefez destê xwe diavêje sînga xwe, bişkokêr xwe diqetîne û sînga xwe vedike, dibêje: "Lêxe lawo, îro roja we ye! Heta gula dawîn berdin! We bavê... bi bêbextî..."

Gotina wî nîvco dimîne... Û celadê wî, wekî ku daxwaza wî ya dawîn bi cih bîne; çardeh guleyan çardeh xwe, di sînga wî de vala dike!...

Zarokên Medya



KOVARA bi navê Zarokên Medya bi hej-mara xwe ya duduyan jî silav li zarokên kurd kir. Kovar li Girtîgeha Bursayê derdikeve û naveroka wê li ser çand û hunerê ye û ji aliyê Abas Alkan ve tê birêvebirin. Di pêşgotina wê de Abas Alkan armanc û mebesta xwe wiha dadixuyîne: "Heke ev kovar bigihîje destê zarokan ezê pir kêfxweş bibim û bigihîjime armanca xwe."

Kovar 13 rûpel e û di ebata A4 de ye. Berga wê jî bi rengên neteweyî xemilandî ye. Wisa xuya dike ku ji du mehan carekê

derdikeve. Di kovarê de çîrok, mamik, helbest, xaçepirs û hwd, cih digirin. Heke em ji hejmara duduyan a Zarokên Medya çend nimûneyan bidin: Çîroka bi navê "Sond" a Abdulqadir Ezîzcan, ku ji Antolojiya Edebiyata Kurdî hatiye wergirtin. Ev çîrok li ser jiyana zarokên ku diçine dibistanê ye. Di çîrokê de lêdanxwarina zarokan ji mamoste, hevparêzî ango têkiliya di navbera zarokan û mamoste de bi awayekî xweş tê pêşkêşkirin.

Dîsa çîrokeke gelêrî jî bi navê "Rovî bû

dixor" di kovarê de cih digire. Ev çîrok jî, li ser fenekiya rovî û bêfêmbûna gur e. Şiirên Mamoste Cegerxwîn jî naveroka kovarê dewlemendtir dike. Her wiha ew helbest, bi mirovan zêdetir didin zanîn ku hêjahiya azadiyê û evîna welêt çî ne. Şiira bi navê "Serxwebûna mirîşkan" li ser berxwedan û serhildanê ye. Gotinên pêşiyên, mamik û xaçepirs jî kovarê dixemilînin.

Kovara Zarokên Medya, di bin şert û mercên girtîgehê de derdikeve, ev yek bi serê xwe hêjahî pîrozkirinê ye.

RÛDAN



Hêviya me hûn in: Hêvî tu yê herî leşkeriyê?

Çiraya li rûyê hêviyê

"Hêviya me hûn in" navê listikeke Şanoya Hêvî ye. Koma şanoyê ya NÇM'ya Îzmîrê, roja 5'ê reşemiyê li NÇM'ya Beyoğlu, bi teknîkeke cihê-reng çiraya xwe li rûyê hêviyê girtin.

Kesên pispor, navê 'şanoya kuçeyan' li vê şeweyê dikin. Şanoger di nava temaşevanan de digerin û pirsên xwe arasteyî wan dikin. Di vê şeweyê de kostûm û dekor bi hinek sembolên biçûk tên diyarkirin. Mînak di vê listikê de cerdevan bi şewqeyekê, leşker bi kasketekê, gerîla bi pûşiyekê tên destnîşankirin. Her wiha derdor jî bi hinek sembolên biçûk diguhere. Di rastiyê de sehneya vê şanoyê kolan in, ji ber vê yekê jî dema li ser dikê tê listin, hinek astengên biçûk derdikevin.

'Hêviya me hûn in' jiyana mirovê kurd li ber çavan radixe. Listik bi mirin û vejîna gelê kurd dest pê dike. Mirina gelê kurd bi hinek gotinên ku kemalîzmê sembolîze dikin, wekî: "Xwezî bi wî kesê ku ji xwe dibêje, ez tirk im." Dîsa vejîna gelê kurd jî bi hinek gotinên ku tevgera azadiyê sembolîze dikin, çêdibe.


Listik bi giştî li ser jiyana xortekî kurd e. Navê wî xortî "Hêvî" ye. Ew li metropolan ji dayika xwe bûye û serpêhatiyên wî, jiyana kurdên metropolan li ber çavan radixin. Mirov kare bibêje Hêvî bi xwe jî sembolek e. Şanoger vê yekê di nava

şanoyê de nîşan didin. Di destpêkê de li nav temaşevanan digerin û dibêjin: "Hêviya me hûn in, hêviya azadiyê hûn in." Dîsa di dawiya şanoyê de pirsê "Hêvî tuyê herî leşkeriyê?" li temaşevanan jî dikin. Zimanê şanoyê jî zimanê kurdên metropolan e, ango kurdî-tirkî ye. Şanoya Hêvî di sala 1994'an de bi vebûna NÇM'ya Îzmîrê, tê avakirin. Ji ber ku di 7'ê pûşpera 1995'an de NÇM hatiye girtin, endamên komê jî xebatên xwe li cihên wekî HADEP'ê didomînin. Heta niha 7 mezin, 2 biçûk, 9 listik pêşkêşî gelê Îzmîrê kirine.

Li gorî agahiyên ku endamên koma şanoyê dan, wan zêdetir ji listikên gelêrî kelk standiye. Endamên komê diyar dikin ku wan hinek listikên gelêrî jî berhev kirine. Li gorî gotina wan, kom jî du beşan pêk hatiye. Ji van du beşan, beşa dramaturjiyê bi karê berhevkerina listikên gelêrî, nivîsandina listikan û karê listikvanîyê re dadikeve û beşa teknîk jî bi karên wekî cil û berg, dekor û ronahiyê re eleqedar dibe.

Tê gotin ku listikên şanoyê bi awayekî kolektîf tên nivîsandin û amadekirin. Di warê zimên de hinek kêmasiyên komê balê dikişînin. Endamên komê dilêşa xwe di warê nebûna lîteratura şanoya kurdî de tînin zimên, lê dîsa jî didin zanîn ku ew ji bo pêkanîna û xurtkirina bingeha şanoya neteweyî xebatê dikin.

SAMÎ BERBANG



TÎŞK

Wergêran

SÎRWAN REHÎM

Resulî Hemzetof delê: "Encamdanî karî wergêran, wekû raxistinî fersêke be pêçewanewe..." Belam, hêja Hemzetof lem

pesne ciwan û pir manaye da, mebestî ewe niye ku rê le ber karî be pêz û hunerî wergêran da dabixat. Nexêr mebestî ewe niye, çunke karî wergêran le berebeyanî mirovayetiye karêkî pêwîst û le cê da buwe û pirdî têgeyîştin û xalî pêkgeyîştinî bîr û ramanî mirovayeti buwe.

Ke biwarekanî pêşewtîna civakîş rû le helkişan dekenî, xêra deken, kê heye nikulî le rolî gewre û karîgerî wergêran bikat?!

Le edebiyat û dîrokî her mîlletêkî zîndû, le rojevî emroy dinya da, hunerî wergêran karêkî berçaw degêrê û qonaxêk niye le lay lanedeyit û be serya rabiburît. Belku ew mezine ye, ke pêwîste tiyay da hemû wişe û destewajekanî zimanî kurdîmanî tê da zaxaw bideyin. Çî lewe xoştîr û be pêztîre emro şakarekanî dunyay edeb, huner, felsefe, ramyarî û hwd.. be zimanî zikmakî xoman bixwênînewe !?

Ey lewe xoştîr çî heye, ke bîr û ra niwêkanman be hoy wergêranewe pêbigat û desbecê germaw û gerim agadarî goran pêşveçûnekan bîn û be diway kerwan da (wekû êstaman) teke tek nekeyin?

Kê le ême 10 kitêbî be kurdî le ser ramyarî, şano, sînema, tendirustî, derûnzana û hwd. xwêndotewe?

Lêre da rewya ye, şitêk be bîrî ewane bixeynewe, ke xoyan û xelkîş be şitî vala we mijûl deken, ba yekî kitêbêk wergêrine ser zimanî kurdî û ew wexte be rastî maftî nazkirdinyan debêt û nazîşyan radegîrêt.

Ew nuseraney ke xoyan be şitî sivikewe xerîk deken, ba karî be pêzî wergêran be encam bigeyenin baştir e û zor xoşiktir nawyan le mêjûy ziman û bûnman da tomar debêt.

Be rastî wextî ewe hatuwe, xo kokeyinewe û yekêti taybet, komeley taybet û enîstîtutî taybet be wergêran çê bikeyin... Ta kû agaman le çîwar dewrî dûr û nizîk bibêt û bizanîn çî le hegbey dîrokî mirovayeti da heye, nimûney miştêk lew xerware tam bikeyin û be dîdarî şad bibîn..

Alêre da, le mijarî wa girîng da, rolî dilsoz aşkira debêt û yekkala debetewe, ke kê xemxor û cigersozey bê xel û xeşî mêjûy raman û bîrkirdinewey gelekeyetî û dexwazê berdêk bixate ser berdêkîtir.

De ba bibînî û bizanîn kê...

Ji sazmana Erzeromê û heta bi

Serhildana

Şêx Seîd



HESEN HÎŞYAR

Der barê “Serhildana 1925’an” de, heta niha her kesekê, çî ji aliyê kurdan û çî jî ji derveyî wan, li ser wê û wêfên wê tiştin gotine û nivîsîne. Ji ber salvegera vê, me xwest em çend rêzenivîs (zincîre) li ser wê, ji pênûsa HESEN HÎŞYAR biweşînin. Ew kes, ku niha ne li jiyane ye (1907/ 1985), di pirtûka xwe ya bi navê “Dîtin û Bîrhatên Min” de behsa vê serhildanê dike. Bêyî ku em têkilî ziman û awayê vegotina wî bibin, bi tenê ji aliyê gramatik û rastnivîsê ve, me hin guherînan tê de çêkir. Peyvên di nava kevanê de ji aliyê me hatine danîn.

Her wekî ji her xwenda, nemaze ji her mêjevanî (dîrokzanî) re xweş diyar e ku di Cenga Cîhanê ya Pêşîn de, vegirtina împaratoriya Osmanî li Rojhelata Navîn û Afrîkayê xerîteyên zemînî û cografî yê minîtiqan hatin guhartin. Li gorî daxwaz û mesalihên dewletên emperyalî, gelek dewletên biçûk û mezin derketin ser meserehên siyasî û ketin ber mirêxa tarîxê. Ew nijadên ku bi xwe nikaribûn û nizanibûn dewletekê bidin sazîkirin, çawa ku serkar û karmendeyên wan ji wê daxwazê re ne pêkar bûn, dewletên emperyalî ji bona gerandîna karên xwe, ew wekî zarokên dibistanan hînî kar, gerandîna hikum, nîzam û qanûnê kirin. Di wê demê de tek û tenha nijada kurd bi Kurdistanê mezîna ve ji bindestiyên tirk û Îranê pê ve ketin bin sîdariyên Sûrî û Iraqê; ku her du jî di bin sîdariyên îngilîz û Firansayê de giriftar bûn. Xerîteya Kurdistanê wekî xaliya eywana kesra, bi çar parçeyan hate parkirin, ku têra xurcikek, Rewan, para ermen jî ket. Belê ji nav wê dûxana herbê, em tenê bi çekên spî û di destê siyasîyên kurd de defterek spî yê bêhisab û bêmafek, kesane di cîhanê de man!...

Tevî ku ji bona xweseriya xwe kurdan ji 1500’an bi emaret û şoreşan ve rabûbûn, ew cenga cîhanê jî, li Kurdistanê hatibû vekirin, ji her mîletên cîhanê zêdetir, di wê cenga dûjehî de kurdan tê de mal û can danibûn. Di warên xebatên siyasî de jî kurd, ji 1908’an ve peyderpey sazmanên (sazûmanên) siyasî dabûne girêdan. Di 1920’an de doza xwe giyandine sazmanên diwêlî (navneteweyî) û civatên aştiyê ya wê herbê, tevî ku ew dewletên nûder ji wan xebatan, tev bêpar bûn jî, giyane wê serfiraziya bêxebat. Bi wê hendesa siyasîyên dewletên emperyalî, li her derên Kurdistanê nijada kurd dihejiya. Çawa ku li hember wê stemkariya Pey-



mana Lozanê, li herêma Sêwasê kurdên Qoçgirî bi şoreşê ve rabûn, li Kurdistanê Başûr jî Şêx Mehmedî li hemberî îngilîz di şoreşeke xwîndar de bû, li Îranê Serekê Eşîra Şikakan Simko, ji bo mafên xwe yê qewmî û tarîxî li hemberî Rîza Şah di şerên giran de bû. Jê û pê ve, li her derê siyasî û ronakên (ronakbîrên) kurd bêsekin li hev digeriyan; bi keser ji hev re digotin: “Ew nijadên ku bi her xesafs û seykojîyên (sosyolojiyên) xwe ve ji me kêmtir, bibin dewlet û em kurdên xwedî tarîx û hezareteke kevin, di welatê xwe de dîl û bindest bimînin!... Ma ji me re mirineke bi ezîzî ne çêti re ji jiyîneke rezîlî lo!” Ronek û sazmanên kurd ên li Stenbolê, bi wê waqîf (bûyerên) tarîxî ji wan re zêdetir rojeke matem bû, ji ber ku ew numa-



Du serokên kurd; li melê çepê Şêx Seîd û li milê rastê jî, Xalîd Begê Cîbirî

yendeyên (temsîlvanên) wan ên ku çûbûne Peymana Sêvirê di ya Lozanê de nebûne pardar, wê peymanê ku dewletên emperyalî ji bona mesalihên (berjewendên) xwe yê stemkarî mafê kurd dabûne bin lîngan; Komîteya Mustefa Kemal jî, bi navê Tirk Cumhuriyetî dewletek dane îlankirin.

Bi wan bûyerên tarîxî, êdî wan sazmanên Stenbolê nikaribûn li wir xwe ji stemkariya wê cumhûriyeta nû biparêzin, ku di erdê Kurdistanê û di nav hêzdariya giranî û piraniya kurd de malikên xebatê bidin vekirin. Bi wê armançê ji wan ronakên Stenbolê Serekê Sazmana Kurd Tealî Cemiyetî, kurê Şêx Ubeydulahê Nehrî, Evdilqadir Efendî, Alî Rîza, kurê Şêx Seîd Efendî, ku di warê bazirganî de keriyên pez dibirja-

bazargehên Stenbolê, li duxana (dibe ku dukan be) Fethulah Efendî dît û êvarê li mala Fethulah Efendî, pê re kete civînê û jê re got:

—Ji bavê xwere bibêje: Evdilqadir gotiye ku li vir ji me re rîya xebatê nema, me divê tu bi zanîna xwe li Kurdistanê, bi hin kesên zana û ji daxwazêrên pêkar, sazmanek siyasî û armançdar bigere sazîkirin.

LI ERZEROMÊ SAZMANA BEREVANIYA MAFÊ KURD

Çawa ku em di wê hîmetê tê de dibînin. Her wekî ew sazman li Erzeromê, bi Serekiya Alahî Kumandanê Eskerî Xalîd Begê Cîbirî hatiye derbaskirin.

Di dawiya sala 1922'yan û di destpêka 1923'an de, ew sazmana li jorgotî, li Kurdistana Bakur û li rojavaya bajarê Erzeromê bi Serekiya Xalid Begê Cibîrî pêk hat. Sazûman ne bi teşkilata partiyek, lê hereketeke bi navê qewmîyeta kurd û doza heqên siyasî bû. Ji ber ku di wî zemanî de kurd, di nîzamên eşayîrî û reşek birokrati de bûn; ji ber wî qasî, ji xwendeyên bilind û ronakan zêdetir, Komîteya Merkezî ya Sazmanê ji hin mezinên rûhî wekî Şêx û meleyan pê ve, tevde ji serekên eşîran û kumandanê leşkerên milîşya (milîs, mebest ji Alayên Hemîdî ye) pêk hatibûn. Di destê wan kumandanên de ji cengawîrên hêzên eşîrî pê ve, di xwendegêhên cengdaryê yên li Stenbolê de jî, dewre dîtî û çar salan li derbendê Kafkasyayê li hemberî leşkerên Qeyser (Çarê Rûs) şervanî bûn. Belê piraniya hêzên şoreşgerên Şêx Seîd, ji wan pêk hatibûn. Ji 1923'an heta 1924'an li gorî programa xwe, di bernameyên xebatê de bingehên fireh di nav welatiyan de dane ber xwe; ji bona şiyarkirinê û berhevkirina înzeyan li her derên Kurdistana digerîyan, ji bona pê anîna şoreşê.

Di 1924'an de wê sazmana Erzeromê kongreyek dane girêdan ku a pêşîn bûn; di wê kongreya tarîxî de, awir li siyaseta derve vedan. Ji bona rojên pêş û berevanî (parêziyê), xwestin destek, alîkarî û dewletek hevalbend bi dest bixin. Di wan guftûgoyan de, hinan gotin em li Sûrî xwe bigihînin (Firansa), hinan gotin bi Iraqê em xwe bigihînin (îngilîz), duduyan ji wan gotin: "Va ye Rûsya nêzîktir bi sînorê me ve ye." Hingê tevan bi yek dengî li her du yan rabûn gotin: "Rûs dewleteke bêdîn e, em tu hêvî jê nakin." Di wê civînê de Şêx Seîd jî rûniştî bû, got: "Hinan îngi-



Şêx Mehmut Berzercî



İsmail Axayê Şikakê (Simko)



İhsan Nûrî Paşa

lîz, hinan Firansa gotin. Kesek ji we nexeyîdî, lê dema ku wan bahsa Rûsya-yê kir hûn zivêr bûn. Hûn di warê siyasî de dostanî û alîkariyê dewelî dixwazin, hingê çi têkiliya we bi dinê dewletan heye?"

Şêx jî, bê ku zanibe di 1920'an de Rûsya û tirkên li Gumriyê peymanêke dostanî bi hev re îmza kirine, dest neda wan. Lê, li ser gotina Şêx Seîd, kongre daxwaznameyekê amade kir; peyayekî siwarî li sînorê Gurcistanê bajarê Ahîska derbas bû û da civata karê wan ê derve (Komîserya), tiştên tê de nivîstî, ev bûn:

—Hûn bi cografîya Kurdistana ve dewletek hemsînorên me ne û ji her dewletên Ewropî çêtir mesele û tarîxa me nas dikin. Çawa ku ji esra (qirna) 19'an ve hûn peydepepe şoreşên me jî yeko yeko dizanin, jê û pê ve dîsa hûn dizanin ku miletekî xerîb, di bawermendiya îslamî de ji Mengolaya (Moxolistanê) derbaî welatê me bûne, li me hikum dikin, stemkariyêke welê ku ba-

werî bi hîqûqên me yên nijadî û tarîxî jî nayînin. Dixwazin me di welatê me de aşimilasyon bikin, heya nahêlin ku em bi zimanê xwe-yên maderî bixwînin û binivîsin. Ji tevaya mafê insanî em bêpar kirine, di warên civatî û aborî de jî her û her dijwariyên mezin digihînin me. Aydiyolojiya (îdeolojiya) we alîkarê miletên bindest e, dema em bi doza xwe ve rabin, hingê em hêviya alîkariyên siyasî ji we dikin. Berî kutahiya nivîsarê, em ihtîrama xwe ji we re pêşkêş dikin, çavênê bersiva we ne. Ji bona civînekê, zeman û mekan spartiyê we ye.

Bi wê daxwazê bersiva wan ev bû:

— Em dizanin hûn ji nijadê arî, kokek Rojhilatê Navîn in. Ji zemanî ku dîr ve, hûn di wê etnogirafiyê (dibe ku mebest cografîya be) de her mayinde ne. Ji milê dîn em dizanin ku di welatê xwe de stembar (mezlûm) in, kesek nikare vê înkâr bike, lê em têkîlî bi hundirê hin dewletên dîtir nakin. Çawa, ji destek alîkariya siyasî re jî em ne amade


ne. Lê dema ku hûn bi doza mafê xwe ve rabin, em alîkariya hikûmeta tirk jî li hemberî we nakin.

Piştî wa bersiva Rûsya-yê, ber bi tu dewleteke din ve neçûn. Bawerî bi nefsa xwe ya zatî anîn, têkiliya tu dewletî bi tu awayî bi wê şoreşê nebû. Ji doza mafê xwe yên qewmî û tarîxî pê ve ji wan re tu daxwaz nebûn, çawa ku her şoreşên kurd bi daxwaza xwe ve rabûne.

Çima berî programa biryar dayîne şoreş çebû?

Di 1916'an de dema Rûsya çar wîlayetên Kurdistana vegirtin (îşgal kirin), hingê dakete Hekariyê û li wir wekî ermen sîleh da fileyên nestûrî yên li wir. Di 1924'an de ji bona meseleya Mosilê (Musûlê) ku tirk leşker kişandê Cizîr û kariyê hingê ji wan nestûriyan sîleh xwestin.

Dûmahîk heye



FIRAT CEWERÎ

Nasnava edebiyata bedew ziman e

Di tîrmeha 1995'an de, rojnameya Yeni Politikayê nêrîna min ya der heqê şairên kurdan de pirsîbû. Yanê şairê kurd kî ye? Min hingê di bersiva xwe de dabû xuyakirin ku yên bi kurdî şîr nivîsandine, şairên kurd her ew in. Min di wê bersivê de navên çend şairên kurdnijad ku di nava şairên tirkên de xwediyan cihên taybetî ne, dabû. Paşê min bihîst hin şairên me dilê xwe girtine, gotine ew kurd in û çima mîna şairên kurd nayêne hesabandin. Gava min gotibû ew ne şairên kurd in, min negotibû ew ne kurd in, an jî ne şairên baş in. Bi rastî jî ew pêşevaniya şîra tirkî ya modern dikin. Erê, ez li vir behsa şîra modern dikim.

Ger em tîkewin nava şîra tirkî ya dîwanê, wê muneqşeya me dirêjtir bibe. Gelek ji şairên zimanê tirkî, bi eslê xwe kurd in. Wan, di warê şîrê de gelek xelat standin, ew di komele û sazgehên edebî de bûne xwediyan berpirsiyan, lê ji bo min, ji bo ku mirov wan mîna şairên kurdan bihesibînin. Mirov dikare navekî wilo li wan bike, şairên tirk ên ku bi eslê xwe kurd in. Di warê edebiyatê de, di warê biserketina edebî de, em dikarin wan mîna edebiyatvanên baş û biserketî bihesibînin. Ez her tim mîna Ehmedê Xanî didim û

ez pêwistiya ku di vir de jî wê mînakê dubare bikim, dibînim. Berî bi sê sed salî Ehmedê Xanî berhema xwe ya ku îro kurd ji ber serbilind in, ne bi tirkî, erebî û farisî nivîsandine, lê wî ew bi kurdî nivîsandine. Loma, îro tirk nikarin Ehmedê Xanî mîna şairê tirk bihesibînin. Lê belê, ew bi hêsanî dikarin Cemal Süreya, Ahmed Arif, Enver Gökçe û bi sedan nivîskar û şairên ku bi eslê xwe kurd in, lê bi tirkî nivîsandine, wekî nivîskar û şairên tirk bihesibînin. Ji bo ku em vî firsendê nedin wan, divê em şîra xwe, çîroka xwe, romana xwe, piyesa xwe bi kurdî binivîsin û bi vî awayî hem ji avakirina edebiyata kurdî re bibin alîkar, hem jî ji bo hişyarkirina hîsên kurdariyê bingehêke biavêjin. Yanê, bi raya min, mijara berhemeke edebiyata bedew çî dibe bila bibe, bi kîjan zimanî hatibe nivîsandin ew dibe berhemeke wî zimanî.

Ger em ji zimên bi rê nekevin û ji mijarê bi rê bikevin, emê piyesa nivîskarî îngilîz Harold Pinter ya navdar "Zimanê Çiya" ne berhemeke îngilîz, lê wê mîna berhemeke kurdî bibînin. Mijara vî berhemê, cihê ku bûyer lê derbas dibe, piraniya qehremanên wê ne îngilîz in, lê kurd in. Dîsan, romana James Aldridge ya bi navê "The Diplomat" ku li ser kurd û Kurdistana ve, ne romaneke kurdî ye, lê ew

romaneke zimanê îngilîzî ye. Romana nivîskarê tirk Ferit Edgü, "O" an jî "Demsalek li Hekariyê", bûyer li Kurdistana debas dibe, piraniya kesên tê de, cih, xweza hemû Kurdistan e. Lê ew berhemeke zimanê tirkî ye. Çîrokên Bekir Yıldız, Osman Şahin û bi dehan nivîskarên di vî babetê de, dîsan ew mînakên edebiyata tirkî ne. Heta hin nivîskarên mîna Esmâ Ocak ku çîrok û romanên xwe li ser çîrçîrok û motifên folklorê kurdî ava dikin jî, dîsan ew nabe edebiyatvaneke kurd. Jixwe ku mirov niha rabe wê mîna edebiyatvaneke kurd bihesibîne, dibe ku ew gelekî hêrs bibe. Salman Ruşdî di ferhenga edebiyata dinyayê de mîna Hindiyê nivîskarê îngilîzî tê naskirin. Romana nivîskarê swêdî Artur Lundkvist "Krigarens Dikt" ku li ser Aleksandrê Mezin (Îskenderê Mezin) e, bûyera dîrokî bi temamî li derveyî Swêdê û dîrî kultura Swêdê derbas dibe, lê ew berhemeke zimanê swêdî ye. Ger em ji edebiyata dinyayê mînakên bi vî awayî bidin wê listeya me gelekî dirêj bibe. Loma, bi ya min, herçî berhemeke edebiyata bedew e, ne mijar, lê ziman rola sereke dilîze. Gava mijara me edebiyata kurdî be, ev rola han bêhtir berbiçav dibe. Ji ber ku zimanê kurdî nişana hebûn û nasnava kurdan e.



Jixwe min jî wilo kir

Zilamek hebû, tim û tim di xwe de dimîst. Jina wî êdî aciz bûbû. Rojekê gotê:
 - Heke tu êdî di bin xwe de bimîzî ezê te bikujim.

Wê şevê zîlamê reben di nav tirs û xofê de raza. Gava ku sibehê rabû, bi xwe hesiya ku çî bûye. Bi xwe de rîbû. Fikirî û bi xwe bi xwe got: "Ez êdî hew xelas dibim."

Kire qêrîn û hawar, giriya û kire haho. Bi qêrîna wî re cînar li ser serê wî civiyan, gotinê:

- Çi bû, ji bo çî tu ew qas diqirî?

Wî got:

- Tew nepirsin, min îşev xewnek dît,

gelekî bi xof bû.

Meraq kirin gotinê:

- Xewna te bi xêr be, de ka ji me re jî bibêje. Te çî dît ku tu ew qas dikî qêrîn.

Mêrik got:

- Xatûn bi taybetî tu guh bidê. Min dît zebeşek (gotin êêêê) li ser piştê hêştirek (gotin êêêêê), hêştir li ser pozê minareyekê, (gotin êêêê), min dît ku ez jî li ser wî zebeşî rûniştîme.

Gotin: "Yabo ku em bûna, me yê di bin xwe de birûtana."

Mêrik got: "Jixwe min jî wilo kir, jixwe min jî wilo kir."

Yek jê tu bûyî ê din nizanîm

Du xortên biyan ketibûn rê diçûn. Qederek bi şûn de di gundekî re derbas dibûn. Dîtin ku du keçikê gihîştî yên xama bi tenê, dên dikutin. Ji wan xortan yekî, piştî ku çav bi wan ket xwe ranegir û ji hevalê xwe re wiha got:

- Ezê klamekê biavêjim ber van keçikan.

Yê din got:

Meke, gundê biyan e, şerm e. Em nizanin bê gotinê te wê çawa bê fêmkirin. Dev jê berde, em ji xwe re li rêka xwe herin heyra. Lawik guh neda hevalê xwe û klameke wiha avête ber keçikan û dest pê kir:

Keçê keçika banî,

Ya ku dikute wî danî

Tu bimirî,

Bimîni.yê vî can î.

Keçik vegeyriyan aliyê ku deng jê dihat. Wan jî di nav xwe de weber dan. Yekê ji wan jî bi klameke wiha, li wî xortî vegeyrand:

Min îşev xewnek ji xwe re dîbû

Li rûyê bavê dudiyar rîbû

Yek tu bûyî, nizanîm ê din kî bû.

Yê ku ji hevalê xwe re gotibû klamekê neavêje ser wan jî, li ser bersiva keçika xama, bi vî awayî lê vegeyrand:

- Ew jî ez bûm.

REMZÎ QALXANL

XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (4)

XAÇEPIRS

M	Z	U	M	S
K	E	M	Î	N
L	Ê	Z	I	M
B	Î	O	R	A
K	Â	X	Î	M
A	F	A	T	D
Î	R	M	E	F
Â	R	Ê	N	A
A	Â	Z	Â	D
E	T	A	Î	R

Bersiva Xaçepirsê (1)

Xaçepirsa me bixelat e.

Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 4'an kitêba.

Cegerxwîn "Şîrên Windabûyî" ye

Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Kesên ku xelata xaçepirsa 2'an kitêba Şerko Bêkes "Şi Nav Şîrên" qezenc kirine: Kemal Başak/Niğde, Dilan Kapazan/Istanbul, Salih Demir/Antalya, İrfan Turan/Izmir, Enver Zeren/Adiyaman, Mazlum Doğan/Mersin, Fikret/Diyarbakır, Dilan Serçuk, İskenderun, Jiyan Bil-kay/Antalya, Tayyib Balka/Çatak-Van

Fistan Hunermen dê kurd (wêne)	Bajarekî Afghanistan Şairekî kurd	Robar Hacetekî cotkariyê	Jan Çav	Xwediyê gund Navçeyêke Mêrdinê	Baneşa neke Dilxweşiyê
→	↓	↓	↓	↓	↓
Mehek →		2		Zindî →	
Şar →				Sembola Osmaniyê	1
→	4		Keç →	3	Liva hawayê
Tirs, xof →			Mîndal →		
Gihane kek →		Sêdark	Dawiya şevê →		
↓	Esil →	6	↓	Gewde →	
	Ger, eger		↓	Gûn	
Rengek →	7	Rêzan →			
→		Pevçûn			
→			Senet, meslek →		
			Notayek		
Koma sewalên kedi →			↓		
Draw →				Qertafek →	
→					
		Enstrûma neke elektronik →		5	

PEYVA VEŞARÎ





'Dibistaneke ku hemû zarok têt de bi cih bibin'

Me agahî ji mamosteyên Gulên Mezrobotan standin, lê fikrên hin zarokan jî, ji devê wan hin bûn. Gulên Mezrobotan, komeke zarokan a Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) ye. Ev kom ji zarokên 4 salî heta 15 salî, tevî zarokên kurd û tirk pêk hatiye.

Îro nêzikî 150 zarok di vê komê de ne û ji bo wan 3 pol (1A, 2A, 3A) û pola ciwanan hatiye avakirin. Bi taybetî li ser muzîk, folklor, tiyatro, resim, çanda giştî û hwd. dersan distînin. Dersên zimanê kurdî ji ber nebûna mamosteyan vala derbas dibin. Endamekî Gulên Mezrobotan Emre, der heqê vê yekê de dibêje ku:

"Di destpêkê de armanca min a yekemîn ew bû ku ez zimanê xwe li vir hîn bibim û pê dersan bibînim.

Van rojan ji ber ku mamosteyên me nîn in, dersên me vala derbas dibin. Ji bo dersa kurdî saetek hatibû veqetandin, carina mamoste tên carina jî nayên. Dema nayên, em jî bi hevalên xwe re sohbetê dikin, an jî lîstika peyvçêkirina kurdî dilîzin. Mesela hevalek peyveke kurdî dibêje, yekî din jî, ji herfa dawî ya wê peyvê, peyveke din çêdike û wisa wisa dewam



Gulên Mezrobotan di xwepêşdanekê de têne dîtin.

Têvî di warê zimên de, Gulên Mezrobotan ji aliyê muzîk, folklor û şanoyê ve gelek bi pêş ketine. Heta vêga 2 kasetên muzîkê ya zarokan derketine: 1-LEZKIN (1993), 2-JI DINÊ RE AŞTÎ (1996).

Li ser xebatên xwe yên li NÇM'ê. Emre, Çiğdem, Yeşim û Yeliz wiha dibêjin: "Em ji xebatên xwe gelek memnûn in. Em gelek ji hevalên xwe jî hez dikin. Carinan problem jî derdikevin, lê herî zêde 5-10

deqîqe em ji hev dixeyidin. Dema bi mamosteyên me re jî problem derkevin, di civîna me ya nixandinê de, herkes pêşniyar an jî rexneyên xwe tîne zimên. Wê çaxê her kes li ser kêmasiyên xwe disekine û xwe rast dike."

Zarokên Gulên Mezrobotan di rojên pêş de ger îmkân bibînin, dixwazin klîpên stranên xwe jî li Kurdistanê çêkin. Ji xeynî vê, dixwazin zarokên kurd tevde bikaribin perwerdehiyeke wisa bibînin.

Bi taybetî Çiğdem li ser vê yekê daxwaza xwe wiha tîne zimên: "Dema dewleta me ava bibe, dixwazim li wê derê dibistanek çêbe. Dibistanekê ku zarok tevde bikaribin têt de bi cih bibin û perwerdehiyê bibînin."

Me ji zarokan xwest ku mamoste û dersên vê derê bi yên dibistanên tirkan re qiyas bikin. Li ser vê yekê tiştên enteresan derketin holê: "Gelek ferq heye di navbera wan de. Li dibistanê zehf dîsîplîn û lêdan heye. Zarok bi giştî ji bo karneyê dixebitin. Mirov nikare bi mamosteyên xwe re biaxive. Lê li NÇM'ê di nav kêf û şahiyê de wexta me dibore. Em dixwazin li vê derê dersên me zehfîr û dagirtîr bin."

Li ser navê Gulên Mezrobotan, Yeliz mesajek dişîne ji zarokên dinyayê re: "Em vêga nikarin bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin. Dewleta tirk her tim asteng bûne li ber me. Ji ber vê yekê em ji zarokên dinyayê re dibêjin ku, em jî wek wan dixwazin bilîzin, di nav aşî û azadiyê de û em ji wan dixwazin ku piştgiriyê bidine me."

Bi rastî jî tevî hemû hewldanên hêzên dagirker ji bo pêşneketina zarokên kurd, êdî mirov dibîne ku, şoreşê berhemên xwe afirandine.

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerîndeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu): SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR
Berpîrsê Karê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
Berpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/Istanbul
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

'Em cîhanê bikin dibistana azadiyê'

Mamosteyên zarokên Gulên Mezrobotan, Kadriye Mutlu (mamosteya rêber û wênesaziyê) û Şener Yıldız (mamosteyê muzîkê) li ser xebatên zarokan pirsên me bersivandin.

Gulên Mezrobotan kengê û ji bo çi ava bû, hûn karin ji kerema xwe re ji me re bêjin? Piştî ku Navenda Çanda Mezopotamya di sala 1991'an de damezirî, pêdiviya komeke zarokan derket holê, lew re ji ev kom hate avakirin. Pêşî bi beşdarbûna 2-3 zarokên xebatkarên vê derê, ji aliyê Rotînda Yetkîner ve bi dersa muzîkê dest pê kir. Dû re jî, bi kesên ji derve hejmar zêdetir û xebat berfirehtir bû. Pêşî tenê dersa muzîkê bû, pişt re dersên folklorê, şanoyê, resim û çanda giştî jî hatin dayîn. Di nav komê de ji xeynî zarokên kurd, zarokên tirk jî hene. Armanç ne tenê perwerdehiya di warê hunerê de ye. Pê re naskirina nasname, cografyaya xwe û bi awayekî giştî perwerdekirina zarokan e.

Bi taybetî di warê muzîkê de xebata we tê xuyan. Di warên din de xebatên we çawa ne?

– Wekî hûn jî dizanin 2 kasetên muzîkê derketin û warê muzîkê gihîştê pengaveke bilind. Lê di warê folklor, tiyatro û resimê de jî gelek berhem derketin holê. Mesela ji berhemên zarokan pêşangeh vebûn. Ji bo şanoyê jî çend heb listikên zarokan hatine nivîsandin. Lê ji ber nebûna sehne (dik), dekor û hwd. ev listik hê nehatine listin. Di warê folklorê de jî ez wisa bawer im ku zarokan xwe dane qebûlîkirin. Ev çalakî di cihê me ye nû de wê zehftir bibin.

Wekî din idealên we çi ne? Li gorî we ev xebat bes in jî bo zarokan?

– Na, ne bes in. Bi awayekî giştî perwerdekirin, lê bi taybetî jî, li ser bransan wê xebat were kirin. Yanî zarok li gorî jêhatîbûn û qabiliyetên xwe û di warê ku tê de serkeftî bin, wê bêne perwerdekirin. Ev kar ber bi profesyonelîyê ve wê here. Hêviya me mezin e.

Îro bi milyon zarokên kurd, ne di saziyê wisa de, ji îmkânên xwendin û perwerdebûnê jî bêpar in. Vêga nêzikî 150 zarok tene NÇM'ê. Li gorî we xebateke wisa wê riyekê veke ji bo zarokên din jî?

– Em di nav hewl û xebatê de ne ku, zarok zêdetir ji vê îmkânê îstifade bikin. Lê li Stenbolê tenê jî, di dema qeydkirinê de hin malbatên û zarokên xwe tevde dixwazin bidin nivîsandin û tevî malbatên tirk. Em ferqûmêliyê naxin navbera wan, lê, îmkânên me bi rastî jî têrê nakin. Piştî demeke din emê cihê xwe firehtir bikin, lê dîsa jî negengaz e ku em bersivê bidin van daxwazan. Eger ji aliyê resmî ve hin problemên me çareser bibin, wê çaxê wê aloziyên perwerdehiyê werin helkîrin. Îro li NÇM'ê di warê hunerê de xebat tê kirin, lê wê çaxê li dibistanan wê bi awayekî giştî hêvotin çêbe.

Li gorî ku tê xuyan zarok bi zimanê xwe nizanin, lê stranên bi tenê ji ber dikin. Hûn hewcedariyê pê nabînin ku ziman jî hîn wan bikin û dersên din jî bi zimanê kurdî bidin?

– Belê. Di vî warê de gelek tengasiyên me hene. Mesela demekê ji Enstîtuya Kurdî mamoste hatin ders da-



Ji milê çepê ve Şener Yıldız, Kadriye Mutlu û Aynur Bozkurt

ne zarokan, lê wê yekê zêde dewam nekir. Ji ber nebûna mamosteyên zimanê kurdî ev problem her li ber me ye. Gerçî jî bo çareserîkirina vê arîşeyê (problem) pêşî divê ji nav malê em dest pê bikin û rola malbatan jî gelek girîng e di vî warê de.

Ji bo dayîna hemû dersan bi zimanê kurdî jî rola mamosteyan derdikeve holê. Nêzikî salekê ye ku em li ser vê yekê serê xwe diêşînin. Bi rastî jî em gelek tengazar dibin li ser vê mijarê. Mesela ji me hin kes hinekî bi zazaqî dizanin, hin kes jî bi kurmançî. Îcar ev zarava jî li gorî devokên xwe ji hev dûr in. Pêşî ev pirsgrêk di nav mamosteyan de divê çare bibê. Ku ev çêbe, ez bawer dikim ku bi perwerdehiyê baş ev problem ji ser zarokan rabe.

Nêzikî 3-4 sal in xebatên zarokan didomin. Çi astengî û tengasî li ber we derketine?

– Bi taybetî problema me ya madî (aborî) li pêş e, ji aliyê manewî ve ez bawer im me gelek tişt safî kiriye. Bi rastî jî xebatkar û zarokên vê derê bi fedekarî xwe didine xebatê. Ji bo helkîrîna problema aborî jî bi taybetî me Yekîtiya Malbatan a Mezopotamya ava kir. Ev Yekîtiya Malbatan ne tenê ji bo çareserîkirina problemên aborîyê, li ser problema hêvotinê jî xebatê dike. Mesela çend caran kermes çêkirin û program li dar xistin jî bo helkîrîna problemên madî.

Ji xeynî van, dewleta tirk jî astengiyên derdixin pêşberî me. Mînak; bi alîkariya Rotînda Yetkîner û Şevîn Civaknas me muzîkaleke zarokan hazir kiribû. Me galayê wê muzîkalê li OKM'ê (Ortaköy Kültür Merkezi) pêşkêş kiribû. Gelek însan hatin û bi coş û heyecanê temaşê kirin. Lê belê dû re me rê nedît ku em li cihên din jî pêşkêş bikin. Me serî li gelek cihan da ku, stadyûm an

jî salon kirê bikin, lê hatin redkirin. Mînakek din jî; sala çûyî programekê me li Holandayê hebû. Zarokan bi her awayî xwe hazir kirin. Dawiyê Konsolosxaneya Holandayê vîze nedane me. Vê jî li ser psikolojiya zarokan bandoreke nebaş hişt.

Ji bo beşdarbûna Cejna 23'ê avrêlê (23 Nisan) hûnê carekê din serî lêdin an na?

– Du salan li ser hev, me serî lê da, feqet nehate pejiwandin. Me çend caran mesaj şande ji Serokkomar, Serokwezîr û Wezîriya Hêvotina Neteweyî re, ji bo ku em jî tevî van programan bibin. Eger maneyêke van programan hebe ji bo wan, divê em jî tevî van programan bibin. Lewre em jî gel in û li ser navê vî gelî em jî dixwazin li wan deran gelê kurd temsîl bikin. Her hewlên me wê berdewam bikin.

Nirxandina her du kasetan hûn dikarin bikin?

– Bi destpêkirina Rotînda Yetkîner û bi berdewamkirina mamosteyên din xebatên muzîkê di nav 2 kasetan de kom bûn. Di kasetan me ya yekemîn de me xwest ku, bi zimanê xwe, bi zimanê kurdî dengê xwe bigihîjînin gelê xwe. Şer her çiqas tesîr li ser mezinan bike jî, her wekî li ser zarokan jî dike. Ji ber wê, ev daxwaza ragihandina dengê zarokan e ji gelên xwe re. Bi taybetî jî wek xebateke neteweyî derkete holê. Di kasetan duyemîn de, tevî van yekan, bi 7 zimanî (kurdî, fransîzî, îngilîzî, almanî, yewnanî, tirkî, erebî) zarok dengên xwe digihîjînin ji gelên dinyayê re. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku di her du kasetan de jî, bi gelên dinyayê re di nav aşî û azadiyê de jiyana tê xwestin.

HEVPEYVÎN
AYNUR BOZKURT